

CIWANÊN KURD'20

HEVŞIBÎ, CUDAHÎ Û GUHERÎN



CIWANÊN KURD'20
HEVŞIBÎ, CUDAHÎ Û GUHERÎN

TÎMA LÊKOLÎNÊ

Yaşama Dair Vakıf (YADA)

Rümeysa Çamdereli
Dr. Uğraş Ulaş Tol

Kürt Çalışmaları Merkezi (Navenda Xebatên Kurdî)

Roj Girasun
Emine Çoban
Suna Kahrıman
Ercan Karan

Rawest Araştırma

Reha Ruhavioğlu
Semra Elmas
Ali Aktaş

Sêwirana Grafikî

Büşra Yurtseven

© Hemû mafên wê veşartî ne. Ti beşeka vê weşanê bêyî destûra Kürt Çalışmaları Merkezi (Navenda Xebatên Kurdî) bi ti awayî bi formata elektronik, mekanîk û bi amrazekê (qeydkirin, depokirina zanyariyê û hwd.) nikare were zêdekirin.

Berfanbar 2020

Ev weşan bi piştgiriya maddî ya Balyozxaneyê İngilistanê û ya Nûnertiya Tirkiyeyê ya Komeleya Henrich Böll Stiftungê, hatiye amadekirin. Naverok bi giştî di bin berpirsyariya Weqfa YADAYê, Komeleya Kürt Çalışmaları û Rawest Lêkolînê de ye û ne mecbûr e ku fikrên Balyozxaneyê İngilistanê û yên Nûnertiya Tirkiyeyê ya Komeleya Henrich Böll Stiftungê, bide der.

Kurte:

Ciwanên kurd yê ku beşeka girîng ya ciwanên tirkiyeyê pêk tîne, hem di veguherîna siyaseta kurdan de hem jî di ya tirkiyeyê de roleka girîng dilîzin. Armanca xebata berdest ew e ku tercîhên siyasî û civakî yê ciwanên kurd û ciwanên gihîştî biresmîne. Di vê çarçoveyê de ev xebat hevşîbiya ciwanên kurd û bi tevahiya ciwanên tirkiyeyê re hevşîbî û cudahiyên wan destnîşan dike û her wiha şayişên ciwanên kurd, hêviyên wan, planên wan ên dahatûyê û tercîhên wan ên bo dinyayê bi xetên bingehîn pêşkêş dike.



NAVEROK

+ Dîteyên Bingehîn	3	5.4. Zimanê Zikmakî	46
+ 1. Destpêk	5	5.5. Tercîhên Siyasî û Hêviyên ji Siyasetê	47
+ 2. Metodolojî	8	5.6. Tercîhên Partiya Siyasî	50
a. Xebata Keşfê	8	5.7. Helwestên li Hember Serokên Siyasî	53
b. Lêkolîna Jimarî	8	5.8. Radîkalbûn û Tundûtûtî	56
c. Merhaleya Wesfî	9	+ Pêvek	59
+ 3. Demografî, Rewşa Perwerdehiyê, Îstihdam	11	+ Encam	61
+ 4. Meylên Sosyokulturî û Tercîh	15		
4.1. Memnûniyeta Jînê	15		
4.2. Xem û Xeyal	17		
4.3. Hîrebûnên Rojanî, Hîrebûnên Medyayê	20		
4.4. Tercîhên Huner, Werzîşê	22		
4.5. Tercîhên Jiyana Taybet	24		
4.6. Nasname	26		
4.7. Tercîhên Jiyana Civakî	29		
+ 5. Pirsgirêkên Bingehîn û Tercîhên Siyasî	35		
5.1. Koç	35		
5.2. Cudakarî	38		
5.3. Ol	42		



Dîteyên Bingeîn

- + Ciwanên Kurd yên Tirkiyeyî di tercîhên xwe yên siyasî û civakî de hevşibiyên cidî nîşan didin. Li gel vê yekê, ev hevşibî hemû girêdayî guherokên bajarê lê tê jiyîn û zayendên di komên cuda de rasertir tê dîtin. Ji lewre di vekolana li ser ciwanên kurdan de pêwîst e paxav bi vê avayîya heterojen were kirin.
- + Ciwanên kurd ji hêla livdariya tîkî ya civakî ve bi awayekî cidî hêvîbexş in. Li gor dê-bavên xwe perwerdeyîtir in. Li gel vê ji hêla îstihdamê ve pirsgirêkên cidî dijîn. Beşeka cidî ya tiral heye. Her wiha beşeka cidî ya ciwanên îstihdambûyî karkerên bêwesf in. Jin di îstihdamê de hinekî din xwedî dezavantaj in.
- + Ciwan ne bextewar in. Nebextewarî li nav mêran û li nav yên li rojavayê dijîn zêdetir e.
- + Problema herî mezin ya ciwanên kurd bêkarî û dahatûya aborî ye. Xeyalên wan berev vê hêlê ve ne. Dixwazin asta xwe ya refahê û kalîteya jiyana xwe zêde bikin.
- + Ciwan, li gorî tevahiya tirkiyeyê zêdetir têkildarî rûdanên siyasî dixuyên. Tê fêmkirin ku emilandina wan a bi awayekî çalak ya twitterê bi vê yekê re têkildar e.
- + Ciwanên kurdan di asteka di ser navekiya tirkiyeyê de azadîxwaz in. Ev meyl bi rêjeyeka mezin ji ser ciwanên ku piştevaniya CHP û HDPyê dikin şikil digre.
- + Nasnameyên wekî misliman, kurd, azadîxwaz û welatîyê cîhanê bi awayekî berbelav ji hêla ciwanan ve tên pêşwazîkirin. Nasnameya welatîyê li komara tirkiyeyê eleqeyê nabîne.
- + Cihêkarî, problema herî mezin ya ciwanan e. Çi li bajarên mezin ên ku koçî wan kirine, çi jî ji gotar û sepanên cudaker û vederker yên li ser medyayê merezdarî ne.
- + Wek berteka bo cudakariyên ku dibînin, toleransa ciwanan bo nasnameyên din zahf nizm e. Heta ku pêkan e torên civakî yên ku di wan de dikarin ziman û çanda xwe bijîn tercîh dikin. Ev tercîh ji serokê şaredariyê heta bi hilibijartina xoşewîst/hevserê dirêj dibe.
- + Ciwan wiha difikirin ku bi taybetî di mijarên mafên jinan, aborî û dadê de pirsgirêkên zahf cidî yên tirkiyeyê hene. Mesafeyê dixin navbera xwe û siyasetê bes eleqedarî wê ne.
- + Perwerdehiya bi zimanê dayikê, cudakarî û perwerdehiyê ji bo kurdan wekî qadên pirsgirêkan dibînin.
- + Meyla radîkalbûnê di nav ciwanên kurd de berev kêmbûnê ve çûye. Li gel vê yekê di kirpandina kurdbûnê, nasnameyê û daxwazên têkildarî wan de zêdebûn dixuyê. Tê dîtin ku meyla radîkalbûnê kêmbûnê dibe bes eleqeya bo siyaseta sîvîl zahf zêde ye.
- + Di nav ciwanan de HDP zahf populer e. Bo AK Partiyê eleqe kêmbûnê dibe. CHP jî bilind dibe. Ji rûyê veguhastî yê CHPyê kêfxweş in û bi berawird dê-bavên xwe zahf kêmtir bêpêşdaraz nêz dibin.
- + Di nav ciwanên kurdan de serokê herî populer Demirtaş e. İmamoğlu jî trendeka ku bilind dibe nîşan dide.



DESTPÊK

1 Destpêk

Li tirkîyeya ku xwedîya yek ji wan rêjeya nifûsa ciwan ya cîhanê û ewropayê ye nifûsa ku di navbera temenê wan 15-29an de ye nêzî bîst milyonî dibe. Ev jimara ku beramberî %23,2yê tirkîyeyê bo me nîşan dide ku tirkîye di niv sedsala li pêşiya me de berdewamî xwediyê rêjeyeka girîng ya nifûsa ciwanan be. Tirkîye bi vê taybetmendiya xwe hem li nav yekîtiya ewropayê di meseleyên ciwanîyê de li cihekî girîng rûdinê hem jî ji bo xebatên ciwanan nasnameya qadeka girîng ya lêkolîn û teqîbkirinê bi dest dixê.

Li hêla din her çiqas ji hejmara nifûsê ya 1927an ya ku aîdiyeta nijad û dînê hatibû pirsîn û di vira de di hejmarên nifûsê yê bûyî de ev aîdiyet nayên pirsîn jî di wê dîrokê de nifûsa kurdan ya ku ji %8ê tirkîyeyê teşkîl dikir, tê dîtin ku di rêjeya yekûna nifûsê ya heta îro de bi awayekî berdewam bilind dibe. Wiha tê texmîn kirin ku rêjeya kurdan ya di nifûsa tirkîyeyê de ku di berfanbara 2019an de ji hêla TÜİKê ve wekî 83 milyon hatibû beyan kirin, 15 an jî 18 milyon e.

Li tirkîyeyê li bajar û herêmên ku nifûsa kurdan bi giranî lê dijîn de ev rêje, ji tevahiya tirkîyeyê bilindtir xuya dibe. Di 18 bajarên ku nifûsa kurdan lê giran e rêjeya ciwanên temenê wan di navbera 15-29an de ye ji %28.1 e. Di bajarên mayî yê tirkîyeyê de ev rêje ji %22.4 e. Em dikarin bibêjin ku dema nifûsa kurdan ya li metropolên wekî Stenbol, Enqere, Îzmîr, Edene, Mêrsîn, Antalya jî tevlê bibe dê ferqa 6 puanî ya di navberê de dê zahf bilindtir bibe.



GRAFİK 1: LI TIRKIYÊ DABEŞA NIFÛSÊ YA KOMA TEMENÎ YA 15-29AN LI GOR BAJARAN



Di nexşeya zarokên biniya 18 salî de rêjeya herî bilind a bajarên ya nifûsa biniya 18 salî bajarên kurdan û bajarên ku kurdan bi giranî koç wan kirine. Di bajarên tirkîyeyê yê başûr û rojavayê de ku nifûsa zarokan li wan bilind e, dema li navçe/semten ku nifûsa zarokan lê giran e, tê nihêrîn dixuyê ku piraniya wan ew cih in ku bi giranî kurd li wan dijîn.



Li gor daneyên ku TÜİK¹ê di sala 2019an de beyan kirine temamê 10 bajarên ku leza zayokiya wan bilind e ji bajarên kurdan pêk tê. Heman dane dîsa nîşan didin ku ji xeynê Riha û Şirnexê bajarekî kurdan yê ku ketiye nav 10 bajarên ku leza nifûsa wan bilind dibe tune ye.

Agiriya ku di leza zayokiyê de di rêza duyem de ye û Mûşa ku di leza pêncem de ye, ji wan 10 bajarên ku nifûsa wan herî zêde kêr dibe du bajar in. Nifûsa Agiriya ku nifûsa wê ya biniya 18 salî ji %47 e, her sal kêr dibe. Li gor van daneyan tê dîtin ku; rêjeya nifûsa kurdan di nav tevahiya nifûsa tirkîyeyê de bi awayekî lezgîn zêde dibe, li gel vê yekê nifûsa kurdan bi awayekî lezgîn diherike bo metropolên rojavayê tirkîyeyê.

Pozîsyona ciwanên kurd di nav hîlbijêrên tirkîyeyê de helbet tenê ji jimareya wan pêk nayê. Bi veguherîna binyata siyasî û nîqaşên siyasî yên tirkîyeyê re, civaka tirkîyeyê jî bi hemû rengên xwe vediguhere û tercîhên nû yên siyasî û civakî tînin rojevê. Ciwanên kurd jî di nav van hemû rengan de xwe nîşan didin. Tercîhên veguherî yên siyasî û civakî yên ciwanên kurd hem bo siyaseta tirkîyeyê hem jî ji bo dahatûya pîrsgirêka kurd xwedî tesîreka potansiyel ya krîtîk e. Lêkolîna berdest tam ji bo xêzkirina çarçove û naveroka vê tesîre hate kirin.

Ev xebat ji xwe re dike armanc ku ciwanên kurd yên li tirkîyeyê dijîn ku temenê wan di navbera 18-30 de ye ji nêz ve nas bike. Bo vê yekê hevpeyvînên qadê yên vê xebatê ji hêla Rawest Lêkolînê ve hatine birêvebirin û berhema van projeyan e: “Promoting Dialogue and Sustainable Conflict Resolution in Turkey (Piştewaniya Diyalog û Çareseriya Pevçûnê ya Domdar li Tirkîyeyê) ku bi rêveberiya Weqfa Sebaret Jîyan (YADA) ji hêla Balyozxaneyê Îngilîstanê tê piştgirîkirin û “Wek Kurdek Ciwan Li Tirkîyeyê: Nasîn û Famkirina Ciwanan” ku bi rêveberiya Navenda Xebatên Kurdî (Kurdish Studies Center) ji hêla Nûnergeha Tirkîyeyê ya Komeleya Heinrich Böll Stiftung ve tê piştgirîkirin. Di vê peywendê de, hevşibî û cudahiyên ciwanên kurd û tevahiya ciwanên tirkîyeyî, planên dahatûyê yên ciwanên kurd û cîhanbîniya wan temaya sereke ya vê lêkolînê pêk tînin. Bo piştgiriya wan em gelekî spasiya balyozxaneyê Îngilîstanê û Heinrich Böll Stiftungê û ya hemû hevalên karî yên ku di vegira vê xebatê de jidil ked dan dikin.

1. TÜİK: Daneyên welidînê, 2019. <https://tuikweb.tuik.gov.tr/PreHaberBultenleri.do?id=33706>



METODOLOJÎ



2 Metodolojî

Lêkolîn li 4 parêzgehên kurdan û 4 hebên tirkan, bi giştî li 8 parêzgehan hate meşandin. Gerdûna lêkolînê, wekî demografî bo 3 herêman hatiye veqetandin û bajar li gor vê yekê hatine diyarkirin. Ji van herêman ya pêşî; herêma ku bajarên ku wekî bajarên kurdan tên zanîn vedigire. Ji vê herêmê bajarên Diyarbekir, Mêrdîn û Riha ku di statuya bajarên mezin de ne, hatine hilbijartin. Herêma duyem; bajarên Edene û Mêrsînê ne ku cîranê parêzgehên kurdan in lê ji kurdan koçê digrin ku em dikarin wan wekî parêzgehên koça nêz tarîf bikin. Stenbol û Îzmîr ku parêzgehên koça dûr yê di nav tirkîyeyê de ne û du metropolên mezin ên li rojavayê ne, wekî herêma demografîk ya sêyem hatine hilbijartin. Li gel komkirina daneyan bi rêbaza jimarî, bi rêbaza wesfî jî dane hatine komkirin û lêkolîneka ji sê merhaleyan pêk tê, hatiye plankirin.

a. Xebata Keşfê

Bi xebata keşfê re hem têkildarî jiyana ciwanên li tirkîyeyê hem jî ya ciwanên kurd, beriya lêkolîna qadê pêş agihîn hatiye armanckirin. Hem bi hevdişinên ku bi ciwanan re hatine kirin hem jî bi lihevexistina lîteratura nivîskî û dîtbarî ya li ser vê meseleyê re hatiye plankirin ku wêneyê herî mezin yê pêkan were derxistin.

Bi awayê pêkan di çarçoveyeka herî fireh de sêwirandina lêkolînê di mijarên wekî planên dahatûyê yê ku ciwan wekî ciwanan çêdikin, pratîkên sosyalbûn û siyasîbûnê, têkiliyên wan ên bi malbatên wan û beşên din ên civakê re, hatine dabînkirin.

b. Lêkolîna Jimarî

Di merhaleya lêkolîna jimarî de di serî de di derbarê komikên sosyo demografîk û binyadên çandî yê xwendekaran, nasnameyên ku xwe pê pênase dikin, çawa însa dikin û watedar dikin, kîjan nirxan dipejirînin, siyaseta li tirkîyeyê tê îcrakirin û xisûsî di derbarê fikrên wan ên li ser pîrgirêka kurdan daneyên rojane hatine kom kirin. Piştî ev dane bi bingeHgirtina guherokên wekî koma temenî, herêma lêkolînê, zayend, pîşe û partiyên ku nêzî wan in, hatine komkomînkirin û hewl hatiye dayîn ku hevşibî û cudahiyên wan werin fêmkirin.

Di merhaleya lêkolîna jimarî de li 8 bajarên ku li jor hatin jimartin bi 1473 ciwanan re bi hevdişinên rû bi rûyî re anketên ku di vegira lêkolînê amade bûne hatine sepandin. Rêjeya ciwanên di navbirka 18-30î salî ya di gerdûna lêkolînê de bi bingeHgirtina daneyên TÜİKê re bi awayekî nêzîk hatiye hesabkirin. Bi sêdwergirtina ji xebatên li ser dabeşîya etnîk û demografîk ya li tirkîyeyê re hewl hatiye dayîn ku li van bajaran rêjeya nifûsa kurdan were diyarkirin û hatiye texmînkirin ku li 8 bajarên navborî yê gerdûnê de dibe ku 1.993.403 kes hebin. Ev jimare hema bêje rastî ji % 33yê ciwanên ku di navbera 18-30 salîya gerdûna xebatê cih digrin, tê. Mînakdana lêkolînê, gerdûnê bi para şaşiyê ya ± 2.5 û ji sedî 95 navbirka baweriyê de, temsîl dike. Mînakdan, bi paHgirtina rêjeya nifûsa ciwanên kurd yê li bajaran û di navbera 18-30 salî de ne, hatiye belavkirin.

	MÎNAKDAN	RÊJE
Diyarbakir	281	19.1%
Mêrdîn	138	9.4%
Riha	253	17.2%
Wan	226	15.3%
Edene-Mêrsîn	152	10.3%
Îzmîr	153	10.4%
Stenbol	270	18.3%
Yekûn	1473	100%

Merhaleya jimarî ya lêkolînê bi formeka anketê ya ku di çarçoveyeka fireh de hatiye vesazkirin re hatiye meşandin. Dema forma anketê dihat sêwirandin taybetmendiyên xweserî xwe yên wekî sosyo-demografiya tirkîyeyê û kurdên tirkîyeyê, siyasî, çandî û nîrxên civakî dihevine li ber çavan hatine girtin. Pirs ji hêla tîma lêkolînê ve hatine amadekirin û ji bo ku dane bikaribin werin berawirdkirin, hindêk pirsên ku li tirkîyeyê di lêkolînên ciwanan de cih digirin, daxilî forma anketê bûne. Hevdîtin bi emilandinê kompûterên tablet û cîhazên biaqil re rû bi rû hatine kirin û her hevdîtinek nêzî 30 deqeyê girtiye. Daneyên ku di merhaleya jimarî de hatine bidestxistin bi emilandinê bernameyên wekî SPSS, JASP, MS Excel û hwd. yên nivîsbariyê, hatine analîzkirin.

c. Merhaleya Wesfî

Armanca lêkolîna wesfî, bi awayekî kûr berhevkerina daneyên texeyulên ciwanên kurd yên li tirkîyeyê yên li ser jiyân, nasname, sosyalbûn, dahatûyê, helwestên wan ên li ser siyasî, têkiliyên wan ên bi ne kurd re û bi awayekî kûr nîrxandina van mijaran û pêvajoyên sazkerinê yên van helwestan û awayê watedarkirina wan e.

Di vê merhaleyê de mînakdana ku hevdîtin bi wan re hatiye kirin; bi bingehegirtina guherokên wekî temen, zayend, herêma ku lê dijîn, rewşa perwerdehiyê, meyla siyasî, sosyo-demografiyê re hatine komkomîkirin û hatiye dabînkirin ku nûnertiye skalaya herî fireh ya ciwanên kurd bike. Merhaleya wesfî ya lêkolînê bi hevdîtinên kûr yên nivî hatine vesazkirin û civînên koma focusî hatiye meşandin.

HEVDÎTINÊN KÛR:	
BAJAR	JIMARA CIWANÊN HEVDÎTIN LIGEL HATIYE KIRIN
Diyarbakir	30
Wan	10
Edene-Mêrsîn	20
Stenbol	30
Îzmîr	10
Yekûn	100

CIVÎNÊN KOMA FOCUS:		
TAYBETMENDIYA KOMÊ	JIMARA CIVÎNÊ	
	HERÊM	ROJAVA
Xwendekar	1	1
Xebatkar	1	1
NEET	1	1
Jin	1	1
Yekûn	1	1



DEMOGRAFÎ,
REWŞA
PERWERDEHIYÊ,
ÎSTIHDAM


3 Demografî, Rewşa Perwerdehiyê, Îstihdam

Ji ber ku kurdên tirkîyeyê bi piranî wekî komeka polîtîk ya homojen tîn nîrxandin, cudahiyên kurdan yê di nav xwe de, tîn piştguhkirin. Bi taybetî ji xeynî jiyana civakî, cudahiyên qada civakî rasterast li derveyî qada tîkildar dimîne. Di vê beşê de hemû biyata heterojen ya ciwanên kurdan yê ku beşdarî lêkolînê bûn, ji hêla sosyo-demografiyê ve tîn nîrxandin.

Em dikarin ji rewşa navmaliyê ve dest bi nîrxandina vê binyata heterojen bikin. Li gor encamên lêkolînê, nêzîkî %75ê ciwanên kurd bi malbatên xwe re dijîn. Bi qasî ji %60ê vê rêjeyê, ciwanên azîb yê ku bi malbata xwe ya mezin re dijîn, pêk tînin. Beşeka ji %16î jî bizewac in û bi malbata xwe ya biçûk re dijîn. Rêjeya ciwanên kurd ên ku tenê an jî bi hevalên xwe re, ji malbatên xwe cuda dijîn ji %17 e.

Ciwanên ku li wargeh an jî pansiyonan dijîn bi rêjeya ji %7î re kêmîneyeka biçûk pêk tînin. Wekî ku ev dabeşî jî nîşan dide piraniyeka cidî ya ciwanên kurd bi malbatên xwe re dijîn. Ev meyl, di nîveka mezinahiya navmaliyê de jî xwe nîşan dide. Li gor daneyên TÜİKê li tirkîyeyê nîveka mezinahiya navmaliyê 3.4 e. Li gor encamên lêkolînê ev rêje di nav ciwanên kurd de heta 5.2an bilind dibe. Ev jimare, bi tenê piştewaniyê nake ku ciwanên kurdan bi tenê bi malbatên xwe re dijîn, ev bilindiya jimara navmaliyên malbatan jî nîşan dide. Ango bi kurtasî, piraniya ciwanên kurd bi malbatên xwe yê mezin û qerebalix re dijîn.

GRAFÎK 2: REWŞA NAVMALÎ YA CIWANÊN KURD






Bêguman amraza herî bingehîn ya livdariya tîkî ya civakî, perwerdehî ye. Wiha dixuyê ku ciwan ji vê rewşê haydar in. Ji %83ê ciwanên ku hevdîtin bi wan re hatiye kirin diyar kirin ku halê hazir li zanîngehekê di beşeka lîsans an jî lîsansa bilind de dixwînin. Ciwanên ku xwedî asteka perwerdehiyê ya lîse an jî jê jêrtir in ji %10.7ê beşdarvanan pêk anîn. Girîngiya ji bo livdariya tîkî ya civakî ya vê dabeşiya raser ya ciwanên ku zanîngehê dixwînin, dema ku me asta perwerdehiyê ya dê-bavên bi beşdarvanan nirxand em dikarin bi awayekî kartêkertir bibînin. Bê guman amraza herî bingehîn bo livdariya tîkî ya civakî, perwerdehî ye. Wiha dixuyê ku ciwanên kurd ji vê yekê haydar in.

Perwerdehiya nêzîkî ji %76î ya dê-bavên ciwanan di asta jêr lîseyê de ye. Nîvê ciwanan jî di halê hazir de xwendekar in. Di nav yên ne xwendekar de jî yên ku asta wan ya perwerdehiyê jêr lîseyê ye bi tenê ji %29 e. Di navbera du nifşan de ji hêla asta perwerdehiyê ve veguherîneka kartêker heye. Kurdên ciwan, bi berawird dê-bavên xwe zahf zêdetir perwerdekirî ne. Ango di piraniya malbatên ku ciwanên kurd bi wan re dijîn de, asta perwerdehiyê du nifşan bi awayekî aşkera ji hev cuda dike.




GRAFÎK 3: REWŞA PERWERDEHIYÊ YA DÊ-BAVÊN CIWANÊN KURD



Her çiqas asta perwerdehiyê ya ciwanên kurd bo dahatûyê hêvîbexş be jî daneyên îstihdamê tabloyeka bifikar xêz dike. Beşa nêzîkî ji %34ê ya ciwanên ku di vegira lêkolînê de hevdîtin bi wan re hat kirin, dixebitin. Jê zêdetir, ji %24ê vê rêjeyê ji karkerên bêwesf pêk tê. Bi gotineka din bi tenê beşeka ji %10ê ciwanên kurd di karekî hêja de dixebitin. Yên mayî an karkerên bêwesf in an jî bêkar in. Dema ku em van daneyan bi nîveka tirkiyeyê re berawird dikin, rewşa bidezavantaj ya ciwanên kurd hinekî din zelal dibe.

Li tirkiyeyê nêzîkî ji du ciwanan yek xwedî kar e. Ev rêje di nav ciwanên kurdan de nêzîkî ji sêyan yek e. Ango rêjeya îstihdamê ya ciwanên kurdan bi awayekî cidî di biniya nîveka giştî ya tirkiyeyê re dimîne. Jê zêdetir nêzîkî ji sêyan yekî ciwanên kurd ne di perwerdehiyê de, ne jî di îstihdamê (NEET) de cih digire. Rêjeya NEETê di pîveka tirkiyeyê de ji %26.5ê bes ev rêje di nav ciwanên kurd de wekî ji %34.6 tê raçavkirin. Bi kurtasî rêjeya NEETê ya ciwanên kurd bi 8 puanî ji ya nîveka tirkiyeyê zêdetir e.

GRAFÎK 4: REWŞA XEBAT Û PERWERDEHIYÊ YA CIWANÊN KURD



Dema dabeşiya zayendê ya di îstihdamê de tê nixandîna pozîsyona bidezavantaj ya jinan, di nav ciwanên kurd de diyartir dibe. Li gel vê yekê, di parametreyên din de bo jinên ciwan ên kurd rewşeka din ya bidezavantaj nîne. Di nav ciwanên kurd de rêjeya jinan ya di perwerdehiyê de bi 3 puanan ji ya mêran, di rêjeya îstihdamê de jî bi 16 puanan kêmtir e. Ango, jin dema perwerdehiyê dibînin her çiqas zêde ne li paş hevçerxên xwe yên mêr bin jî dema mesele tê ser dîtina karî, bi awayekî cidî li pey wan tên hiştin.

Li hêla din, rêjeya NEETê ya jinên ciwan ên kurd bi tenê bi 3 puanan di ser nîveka tirkîyeyê re ye. Lê belê, rêjeya NEETê ya mêrên ciwan ên kurd du qatî zêdetirî nîveka tirkîyeyê ye. Ev yek nîşan dide ku di navbera mêrên ciwan ên kurd de tiraliyeka cidî heye. Wekî ku li jor hat behskirin, dema ku li rêjeya bilind ya karkerên bêwesf yên ciwanên kurd tê fikirîn, ev dane watedartir dibin. Mêrên ciwan ên kurd yên ku di karên bêwesf de dixebitin ku herî zêde dê ji qeyranên aborî û geremolan tesîr bigirin, ji van hemû pêldanên aborî bi berawird hevçerxên xwe yên tirkîyeyî zahf zêdetir tesîrên neyînî digirin.

TABLO 1: DI NAV CIWANÊN KURDAN DE RÊJYÊN ÎSTIHAMÊ Û DABEŞIYA NEETÊ DI PÎVEKA TIRKIYÊ DE

	YEKÛN	MÊR	JIN		MÎNAKDAN	TIRKIYE
Di perwerdeyê da	30.5%	32.3%	28.9%	Jin	43.1%	39.8%
Di îstihdamê da	34.9%	43.1%	27.0%	Mêr	27.0%	13.8%
NEET	34.6%	24.6%	44.1%	Nîvek	34.7%	26.5%



MEYLÊN
SOSYOKULTURÎ Û
TERCÎH


4 Meylên Sosyokulturî û Tercîh

4.1. Memnûniyeta Jînê

Ciwanên kurd bi asta memnuniyete re bi awayekî cidî ji hevçerxên xwe cihê dibin. Asta giştî ya memnuniyete ya ciwanên kurd bi awayekî eşkere ji nîveka tirkîyeyê kêmtir e. Çi rêjeyên îstihdamê yên ku li jor hatin behskirin, çî jî dema azmûna siyasî û civakî ya ku kurdan di pênc salên dawî de jiyân, li ber çav were girtin ev meyl dikare şaşwaz neyê dîtin. Dîsa jî memnûnbûna kêmtir ya ciwanên kurd ji hemsalên xwe û ev memnûniyeta ku li her qada jiyânê dikare were raçavkirin, têra xwe bifikar e. Ciwanên kurd hem ji bajarên ku lê dijîn hem jî ji mayîna li tirkîyeyê ne memnûn in.

Nîveka asta bextewariyê ya ku ciwanên kurdan di skalaya 1-10an de dinirxînin, di 4.6an de dimîne. Ev rêje li tevahiya tirkîyeyê 6,1 e. Li welêt asta nîvekî ya memnûniyeta di derbarê jînê de 3,8 e, ev jimare li bajarên dibe 4,8. Li gel vê yekê, rêjeya memnûniyeta ji xizmetguzariyên şaredariyê 3,5 e. Ev dane hemû bi giştî bi du puanan ji nîvekiya tirkîyeyê kêmtir e û her li hêla nememnûniyete ne.

GRAFÎK 5: RÊJEYA KÊFXWEŞIYÊ YA GIŞTÎ Û HERÊMÎ YA CIWANÊN KURD





Berawirdkirina rêjeya memnûniyetê ya ciwanên kurd bi ya bajarên mezin ên bingehîn yên tirkîyeyê re jî tabloyeka balkêş derdixe holê. Ciwanên kurdan, ji hevçerxên xwe yên ku li bajarên mezin ên bingehîn dijîn

nebextewartir in. Rêjeya bextewariyê ya ku di skalaya 1-10an de tê nirxandin, bo ciwanên kurd bi berawird hevçerxên wan ên li bajarên mezin, herî kêmtir 1,5 puan kêmtir e.

TABLO 2: BERAWIRDKIRINA RÊJEYA KÊFXWEŞIYA CIWANÊN KURD BI MEYLÊN GIŞTÎ YÊN CIWANÊN LI BAJARÊN MEZIN ÊN TIRKIYÊYÊ DIJÎN

	MÎNAKDAN	STENBOL	ENQERE	ANTALYA	ÎZMÎR
Memnûniyeta ji jiyîna li bajêr	4.78	6.26	6.26	6.64	7.13
Bextewarî	4.64	5.95	5.63	6.26	6.64
Memnûniyeta ji jiyanê	4.52	5.91	5.56	6.27	6.47
Memnûniyeta ji jiyîna li welêt	3.82	6.03	6.05	6.09	6.05
Memnûniyeta ji xizmetguzariyên şaredariyê	3.51	6.10	5.45	6.29	6.84

Jê zêdetir, bi çûna berev rojavayê ve zêdebûna vê rêjeya nememnûniyetê ya di nav ciwanên kurd de, meyleka cuda îşaret dike. Her çiqas ferq ne zêde be jî rêjeya ciwanên kurd yên ku li bajarên mezin ên rojavayê dijîn ji rêjeya memnûniyetê ya herêmên ku bi piranî kurd lê dijîn bi awayekî îstiqrar kêmtir e.

Mêr li gorî jinan nebextewartir û nememnûntir in. Hevterîbî vê yekê yên di koma NEETê de jî li gor xwendekar û xebatkaran nebextewartir in. Dema ku em para mêran ya di koma NEETê de li hesabê zêde bikin, em dikarin bibêjin ku sedemeka mezin ya nememnûniyetê, aborî ye. Jixwe, xem û xeyalên ciwanên kurd jî vê yekê nîşan didin.

TABLO 3: KÊFXWEŞÎ Û DI NAV CIWANAN DE DABEŞIYA KRÎZA TÊGIHANÊ


	YEKÛN	PARÊZGEH (2LIBÎ)		ZAYEND		REWŞA XEBATÊ		
		HERÊM	ROJAVA	JIN	MÊR	NEET	XWENDEKAR	DI ÎSTIHDAMÊ DE
Krîza aborî heye?	4.14	4.06	4.27	4.14	4.14	4.04	4.23	4.17
Bextewarî	4.64	4.74	4.49	5.01	4.31	4.48	4.92	4.56
Memnûniyeta ji jiyanê	4.52	4.59	4.41	4.80	4.27	4.33	4.74	4.51
Memnûniyeta ji jiyîna li welêt	3.82	4.05	3.46	4.01	3.65	3.81	3.74	3.90
Memnûniyeta ji jiyîna li bajêr	4.78	4.99	4.46	4.91	4.67	4.78	4.81	4.76

4.2. Xem û Xeyal

Çavkaniya herî mezin ya xemê ya ciwanên kurd, aborî ye. Rêjeya ciwanên ku bêkariyê û pirsgirêka debarê wekî xema xwe ya herî mezin nîşan didin ji %62an derbas dike. Heke em xema dahatûyê ya di rêjeya ji %5,7î û bi ya ji %5,8î re ciwanên ku kategoriya perwerdehiyê hîlbijartine jî têkildarî aboriyê bifikirin, em bi rehetî dikarin bibêjin ku sedema herî raser ya xema ciwanên kurd, aborî ye. Ciwan li gel ku rewşa xwe ya aborî têkildarî siyasetê dikin, rasterast xemên siyasî jî tînin zimên.

Dema ku em siyasî yên wekî şer, edalet jî lê zêde dikin di nexşeya xemê ya ciwanên kurd de yên ku şayişên siyasî rasterast tînin zimên pareka ji %20î vedigirin. Her çiqas ciwan eleqeyeka kêr nîşanî bûyerên siyasî yên germ didin û rasterast xemên siyasî piştî kategoriyan aborî û bêkariyê tînin zimên jî hemû xemên wan di esasê xwe de di peywendeka siyasî de bi cih dikin. Şayişên civakî yên wekî pergala siyasî, edalet û tenduristî di nexşeya xemê ya ciwanên kurd de roleka hêja digirin.

GRAFİK 6: ŞAYIŞÊN CIWANÊN KURD



Ji ber ku pergala edaletê ya li welêt nayê pêşbînîkirin, ciwan xeman dixwin. Bi taybetî ciwanên ku nasnameya kurdî dikirpînin, ji ber neheqiyên ku tînin kirin xeman dixwin ku ji ber nasnameyên wan tiştek were serê wan jî. Li hêla din, ciwan her çiqas xemên wan ên şexsî hebin

jî difikirin ku bi awayekî dê rewşa wan baş bibe û bi ser kevin. Ji civak û pergale bawer nakin. Xeman ji vê yekê jî dixwin ku potansiyela wan ya tesîrkirina li ser dahatûya wan heye.




Xeyalên ciwanên kurd jî wekî xemên wan berê pêşî li rojevên şexsî tîr dibe. Ji %50yê ciwanan daxwazên wekî kar, kariyer, xanî an jî erebeyê di nav xeyalên xwe yên pêşdatir dihejmêrin. Bi %12ê re ger xeyala duyem ya herî berbelav derdikeve pêş, xeyala aramî û bextewariyê jî bi rêjeyeka şibî wê di rêza sêyem de cih digre

Ciwan, çawa difikirin ku xemên wan di esasê xwe de siyasî ne, wisa jî difikirin ku xeyalên wan jî ancax bi normalbûna siyasî re dê pêkan bin. Ji ber sedemê, pêkan e ku armancên civakî di nav xeyalên şexsî de werin dîtin. Gelek ciwanên kurd dixwazin ku kariyereka baş yê piyekî wê yê derve heye, bikin û bi vê yekê re ji hêla aboriyê ve serbixwe bibin.

Ciwan piştî ku ji hêla aboriyê ve karê xwe bi cih kirin, dixwazin li cîhanê bigerin û bi kirina karinên ku fêda wê bigihêje mirovan re tevkariyê li guherîna civakî bikin. Ji lewre, dema em li xeyalên şexsî dinêrin pêkan dibe ku em armancên civakî jî bibînin.


GRAFÎK 7: XEYALÊN CIWANÊN KURD




Xaleka din ya girîng jî li ser daxwaza gerê ye. Arezûya derwelêt bi tenê ne encama reva ji welêt û hesta xelasiyê ye. Dîtin û naskirina çandan, cihên din, ger, kar an jî hewldana fersendekê bi mebesta dahatê jî tesîrdar e. Lê belê helbet wiha dixuyê ku hestkirina nerehetiyê ya li welêt û nememnûniyeta wan jî meylên wan ên derwelatiyê xurt kiriye. Arezûyên wekî koçkirina bo welatên rojavayê ji 90an heta serê 2000an wekî ku tê dîtin ne polîtîk e, zêdetir ji xemên aborî ber dixwe û piştî sererastkirina karan veger tê plankirin.

Nêzîkî ji %58ê ciwanên kurd dixwazin li derwelêt perwerdehiyê bibînin. Li gel vê yekê welatekî berbelav û raser jî nîne. Welatên ku ciwan dixwazin lê bixwînin bi rêjeyeka mezin ji bakurê emerîkayê û ewropayê pêk tên.

GRAFÎK 8: DI NAV CIWANÊN KURD DE MEYLDARIYÊN PERWERDEYA DERWELATÎ



HÛN DIXWAZIN LI KÎJAN WELATAN PERWERDEHIYÊ BIBÎNIN?



Xemên ciwanan, hêviyên wan ên têkildarî dahatûyê jî zeîf dike. “Bo ku bibe moral ji min re, hêvîdar im.”, “Heke ez hêvîdar nebim ez ê nikaribim hêviyê bidim yên derdora xwe jî.” Bi hincetên wiha hewl didin hêvîdar bibin. Gelek ciwan wiha difikirin ku dikarin ji heq jiyane derkevin û wekî şexs hêzdar in. Li gel vê yekê, bi awayekî xurt hest pê dikin ku ji ber ku kurd in ketine pozisyonê bidezavantaj û “dest û piyên wan hatine girêdan.” Di sernavên malbatî, şexsî û aborî de diyar dikin ku pêdiviya wan bi dahatûyeka ku xemên wan sernavan dabîn bikin heye û hêvî dikin ku pêvajoya wiha bimeşe. Li hêla din, di nav ciwanên kurd de, yên dibêjin ku bi giştî ciwan bi rêbazên têkoşînê yên nifşa nû re dê hêvîbexş bin, hene. Beşdarvanek wiha dibêje:

“ Bo nimûne ji ber turîzmê dîroka ezmûnê hat guherîn û ciwanan jî bi hev re puanek dan sepna mobîlê ya şîrketa turîzmê ya Wezîrê Turîzmê û reytinga sepnanê daxistin. Ev yek min hêvîdar dike.



4.3. Hîrebûnên Rojanî, Hîrebûnên Medyayê


Hîrebûnên rojane yê ciwanên kurd dişibin meylên giştî yê tirkîyeyê. Nîvê ciwanan diyar dîkin ku cixarê dikişînin, ji sêyan yek alkolê diemilînin û ji %5ê wan jî tiryakê diemilînin. Ev hemû rêje, nêzîkî nîveka tirkîyeyê ne. Emilandina cixareyê bi puanekê kêmtir ya nîveka tirkîyeyê, emilandina alkolê bi 4,5 puanan bilind e. Di emilandina tiryakê de jî bi puanekê ferqeka pozîtîf heye. Cixare, nargîle, alkol û an jî emilandina tiryakê bi piranî di nav beşdarvanên mêr û/an jî yê azîb de dixuyê.

TABLO 4: BERAWIRDKIRINA EMILANDINA MADEYÊN BIZIRAR

	MÎNAKDAN	TIRKIYE
Cixare	48.6%	49.6%
Alkol	35.4%	30.7%
Tiryak	5.0%	4.1%

Navbera ciwanên kurd bi înternetê re zahf baş e. Ji %24ê ciwanan diyar dîkin ku hema bêje temamê rojê înternetê diemilînin. Ji %41ê wan jî diyar dîkin ku rojê 3-5 saetan înternetê diemilînin. Em dikarin bibêjin ku ji %78ê ciwanên kurd rojê herî kêmtir du saetan bi înternetê xerc dîkin.

GRAFÎK 9: EMILANDINA ÎNTERNETÊ YA CIWANÊN KURD



Ciwanên kurd înternetê hem zêde diemilînin hem jî cuda diemilînin. Di nava ciwanên kurd de emilandina twitterê gelekî di ser ya nîveka tirkîyeyê re ye. Di nav ciwanên tirkîyeyê de emilandina twitterê ya ku ji %30 e, di nav ciwanên kurd de derdikeve heta asta ji %44an. Dema tê fikirîn ku twitter li gor platformên din ên medyayê xwedî qerektirêkî polîtîktir e, em

dikarin bibêjin ku ciwanên kurd wekî alternatîfa medyaya desthilat twitterê dişopînin, ev yek jî ji ber ku bi berawird hevçerxên xwe zêdetir eleqadarê rojeva polîtîk in. Di nav ciwanên kurd de emilandina zêde ya ferhengên înternetê ku tim û tim nîqaşên siyasî li wan tê kirin jî ji nîveka tirkîyeyê zêdetir e ku ev yek dikare di vê peywendê de were ravekirin.

TABLO 5: EMILANDINA MEDYAYA CIVAKÎ YA CIWANAN

Endametiya we bo kîjan platformên medyaya civakî hene?	MÎNAKDAN	TIRKIYE
Instagram	83.4%	80.0%
Komên Whatsappê	54.1%	50.7%
Twitter	43.7%	29.7%
Facebook	41.3%	44.4%
Qenalên Youtubeyê	17.0%	20.6%
Spotify	9.6%	3.9%
TikTok	6.5%	6.7%
Pinterest	6.1%	2.9%
Ferheng	3.5%	1.5%
Bloga we	1.4%	0.9%
Tinder	0.3%	0.5%

HILBIJARTINÊN GIŞTÎ YÊN 2018AN

	YEKÛN	AK PARTÎ	CHP	HDP
Fox TV	31.2%	19.9%	39.4%	34.5%
Nûçeyan ji TVyê naşopînim.	28.0%	23.7%	30.9%	26.4%
Li TVyê temaşe nakim.	19.2%	15.5%	17.0%	18.9%
A haber / ATV	7.0%	28.2%	0.0%	1.1%
Stêrk TV, Ronahî TV, Medya Haber û hwd.	6.6%	0.7%	5.3%	12.0%
NTV / CNN Türk	3.5%	5.2%	6.4%	1.7%
Qenalên TRTyê	2.7%	6.5%	0.0%	1.7%
Artı TV	1.5%	0.0%	0.0%	3.2%
Halk TV	0.4%	0.3%	1.1%	0.6%

Hîrebûnên temaşekirina televîzyonê ya ciwanên kurd jî ji meylên ciwanên li tirkîyeyê cuda dibin. Hîrebûnên temaşekirina parodî, komedî, aksiyon û rêzefilmên rojane yê ciwanên kurd her çiqas meylên ku dişibin nîveka tirkîyeyê nîşan bide jî ciwan ji rêzefilmên tore û eşîretan dûr disekin. Rêjeya temaşekirina rêzefilmên toreyî ji hêla ciwanên kurd ve bi 5 puanan kêmtir nîveka Tirkîyeyê ye.

Dîsa di vegira lêkolînê de hat raçavkirin ku bi gurayî rêzefilmên welatperwerî yê ku ji pirsgerêka kurdan ber dixe “neteweperest û mîlîtarîst” dibînin, mesafeyê dixin navbera xwe û van rêzefilmên. Ciwan ji ber ku kurd bi awayekî siyasî û civakî rast nayên fêmkirin, aciz in. Li gel vê, ji rewşa ku wan aciz dike û bi destê medyayê û bi rêbazeka polîtîk bi rêya rêzefilmên tîn berbelavkirin, giliyan dikin.



“ Kêfa min ji rêzefilmên ku mijara wan civakî ne tê. Mesela kêfa min ji rêzefilmên wekî *Diriliş Ertuğrul*, *Kurtlar Vadisi* re nayê. Li gor min ew rêzefilmên wiha ne ku pevçûna civakî han didin.

“ ...min li du sezonên pêşî yê *Diriliş Ertuğrul* temaşê kir bes piştî ku rihên neteweperestî yê girseya ku li vî rêzefilmî temaşê dikin, bilind bû, min dev jê berda.

“ Rêzefilmên ku herî zêde ji wan hez nakim yê ku li ser *tore*, *eşîran* in. Hez nakim çiku dibe berê qewimîbin lê niha ew neman.

TABLO 6: TERCÎHÊN TELEVIZYONÊ YÊN CIWANAN

	MÎNAKDAN	TIRKIYE
Bernameyên parodiyê	43.4%	43.5%
Rêzefilmên komediyê	38.8%	36.6%
Rêzefilmên aksiyonê	29.1%	35.6%
Rêzefilmên parodiyê	28.9%	32.5%
Rêzefilmên serdemî	22.0%	21.7%
Rêzefilmên dîrokê	19.9%	29.7%
Rêzefilmên komediya romantîk	14.7%	26.8%
Rêzefilmên welatperweriyê	14.6%	29.3%
Rêzefilmên rojhilatê, yê tore û eşîretan	14.5%	20.9%
Rêzefilmên rojane	14.3%	20.1%
Dramên romantîk	13.8%	25.3%
Rêzefilmên malbatê	13.0%	21.2%

4.4. Tercîhên Huner, Werzîşê

Rûdanên siyasî yê li tirkîyeyê û cudakarî tesîrê li hîrebûnên ciwanan yê wekî jiyana rojane, sosyalbûn û hengkirinê dike. Ciwanên ku cudakariyê dijîn, zêdetir pêdivî bi xebat û sosyalbûna hawîrên fizîkî û ferazî yê ku kurd lê ne, dibînin.

Wekî encameka vê meylê, ciwanên ku li bajarên ku koçî wê kirine, tûşî cudakariyê bûne tercîh dikin ku bi kesên azmûnên şibî yê wan jiyane bijîn û jiyana civakî bi wan re parve bikin. Hevterîbî vê yekê, meylên guhdarkirina li muzîka kurdî, axaftina kurdî, layengiriya tîmên kurdan, yên ciwanan bilind dibe. Beşdarvanek vê rewşê wiha kurte dixe:

“*Mesafeyê dixim navbera xwe û yên ku [cudakariyê] dubare dikin. ... ez tercîh dikim ku qadên xwe teng bikim. Zêdetir tercîh dikim ku li qadên ku kurd lê ne sosyal bibim. An jî tercîh dikim ku bi mirovên ku dê bikaribin bizanibin kurd an jî dîkebûn çî ye, hevdîtinan bikim... (Stenbol, jin)*

Hunermendên ku ciwanên kurd ew diecibînin di yelpazeyeka ku ji Ahmet Kaya ta Sezen Aksuyê, ji Müslüm Gürses ta İbrahim Tatlıses, ji Yıldız Tilbe ta Tarkan dirêj dibe, hevşibiyar bi tercîhên ciwanên tirkîyeyê nîşan didin. Li gel vê yekê, bi piranî ciwanên kurd li stranbêjên wekî Ciwan Haco, Şivan Perwer, Mem Ararat, Şakiro û Aynurê guhdar dikin.

Ciwan ji hêla repertuara muzîkê ve hem ji ciwanên tirk ên nifşê xwe hem jî bi guhdarkirina hunermendên wekî Aynur û Mem Ararat re ji nifşê berê yê ciwanên kurd cuda dibin.

TABLO 7: LI GOR MEYLDARIYÊN PARTIYÊN SIYASÎ YÊN CIWANÊN KURD TERCÎHÊN STRANBÊJAN

	TOTAL	AK PARTİ	CHP	HDP
Ahmet Kaya	19,6%	19,4%	13,5%	21,4%
Sezen Aksu	7,3%	5,7%	13,5%	5,4%
Ciwan Haco	5,2%	0,7%	4,5%	8,1%
Müslüm Gürses	3,9%	5,7%	5,6%	2,2%
Şivan Perwer	3,1%	0,7%	1,1%	5,5%
Mem Ararat	3,1%	1,4%	0,0%	4,7%
İbrahim Tatlıses	2,5%	6,0%	1,1%	1,1%
Neşet Ertaş	2,2%	2,1%	2,2%	1,4%
Şakiro	1,7%	0,4%	1,1%	3,0%
Selda Bağcan	1,7%	2,1%	1,1%	1,6%
Yıldız Tilbe	1,5%	2,5%	0,0%	0,9%
Aynur Doğan	1,4%	2,5%	0,0%	1,4%



Tesîreka din ya tengbûna qadên sosyalbûnê jî di tercîhên tîmên werzîşê de xwe nîşan dide. Di nav ciwanên kurd yê ku werzîşê dişopînin de Amedspor bi taybetî eleqeyê dibîne. Li bajarên ku pirsgirêka kurdan zêdetir rojevê dadigire û li metropolên wekî Stenbol, Îzmîr yê dûrî herêmê jî Amedspor zêdetir alîgiran berhev dike. Jê zêdetir her ji 10 ciwanên HDPyî 2 heb û her ji 10 ciwanên CHPyî 1 Amedsporê digirin bes ev rêje di nav ciwanên ku nêzî AKPyê ne, kêmtir e.

TABLO 8: TERCÎHÊN TÎMÊN WERZÎŞÊ YÊN CIWANÊN KURD

Tîma futbolê ya ku piştgiriya wê tê kirin	Total	Diyarbakir, Wan, Mêrdîn	Stenbol, Îzmîr	Edene, Mêrsîn	Riha
Galatasaray	40,5%	40,2%	35,2%	40,5%	48,2%
Fenerbahçe	23,6%	21,0%	20,2%	34,5%	29,0%
Beşiktaş	22,2%	23,2%	23,5%	20,7%	18,8%
Amedspor	11,9%	13,2%	18,6%	4,3%	3,6%
Tîmên biyanî	1,8%	2,4%	2,6%	0,0%	0,4%

	TOTAL	JIN	MÊR	AK PARTÎ	CHP	HDP
Galatasaray	40,5%	39,4%	41,3%	48,0%	34,6%	35,9%
Fenerbahçe	23,6%	25,0%	22,5%	27,6%	27,2%	20,6%
Beşiktaş	22,2%	26,5%	18,8%	22,4%	27,2%	21,9%
Amedspor	11,9%	8,1%	14,9%	1,6%	11,1%	19,2%
Tîmên biyanî	1,8%	0,9%	2,6%	0,4%	0,0%	2,4%

4.5. Tercîhên Jiyanî Taybet

Ji sê paran pareka zêdetir ya ciwanên kurd bi hevarek jin/mêr re ne. Dîsa nêzî ji sisêyan yekê heke xoşewîstek wan hebe an jî çêbibe, diyar dikin ku ew wê/wî ji malbat û derdora xwe vedişêrin an jî dê veşêrin. Wekî ku dê were texmînkirin di vê mijarê de jin li gorî mêran zêdetir pêdivî bi veşartinê dibînin.

TABLO 9: STATUYÊN JIYANA TAYBET YÊN CIWANAN

	MÎNAKDAN	TIRKIYE
Xoşewîsta min heye	35.5%	40.3%
Xoşewîsta min nîne	64.5%	59.7%

Ciwanên kurd rewşên wekî xoşewîstî, flort, destgirtinê normal dibînin bes sînoran datînin jê wêdetir. Yê ku sînorên wan herî nerm ciwanên CHPyî, yê herî sext yê AKPyî ne. Ciwanên HDPyî di navbera van her duyan de, nêzî yê CHPyîyan bes li cihekî hinekî ji wan muhafazakartir disekin.

Di rewşa heyî de dema li gor bajarê ku lê tê jiyîn senifandin tê kirin, diyar dibe ku yên li rojavayê dijîn nermtir in ji yên ku li herêmê dijîn. Jin li gorî mêran bi awayekî erênî li merhaleyên wekî flort, xoşewîstiyê dinêrin bes mêr di merhaleyên din de nermtir in.

TABLO 10: TERCÎHÊN JIYANA TAYBET YÊN CIWANÊN KURD

HILBIJARTINÊN GIŞTÎ YÊN 2018AN				
Beriya zewacê ne rast e	YEKÛN	AK PARTÎ	CHP	HDP
Têkiliya cinsî	61.6%	92.4%	38.3%	51.8%
Bi hev re jiyîn	56.6%	87.2%	34.0%	46.7%
Hevmaçkirin	37.4%	62.2%	22.3%	28.4%
Flortkirin	18.7%	29.3%	10.6%	15.0%
Girtina destan	17.7%	28.6%	10.6%	12.8%
Têkiliya xoşewîstî	15.2%	26.0%	10.6%	10.5%

Kîjan dikarin werin kirin n/10	YEKÛN	PARÊZGEH (2LIBÎ)		ZAYEND	
		HERÊM	ROJAVA	JIN	MÊR
Flortkirin	3.75	3.64	3.92	3.85	3.66
Têkiliya xoşewîstî	3.83	3.72	4.00	3.88	3.79
Girtina destan	3.79	3.67	3.97	3.81	3.76
Hevmaçkirin	3.17	2.95	3.53	3.08	3.26
Têkiliya cinsî	2.37	2.10	2.80	2.20	2.53
Bi hev re jiyîn	2.57	2.37	2.90	2.37	2.75

Gelek ciwanên kurd, di nav pirsgerêkên herî girîng de pirsgerêka zimanê zikmakî û cudakariyê nîşan didin. Her çiqas emilandina rojane ya zimanê zikmakî kêr dibe jî zindîgirtina kurdî encameka tercîhên nasnameyê ye. Ciwanên ku tûşî cudakariyê dibin hem li zimanê xwe yê zikmakî hem jî li nasnameya xwe zêdetir xwedî derdikevin. Bi awayekî nêz, tercîhên nasnameyê tesîrê li tecrubeyên sosyalbûnê yên ciwanan û heta li tercîhên zewaca wan jî dike. Daxwaza zewaca bi kesek kurd re, carna ji arezûya zewaca bi kesek ji heman çandê re bo berdewamkirina wê çandê carna jî ji ber sedema neheqîya ku lê hatiye kirin ji nêzîkbûna zêdetir ya/yê kurd, ber dixwe. Di mijara zewacê ya ciwanan de bi piranî yek ji wan kirpandinên bawerîya hevpar, çanda hevpar û zimanê hevpar an jî ji yekê zêdetir, derdikeve pêş. Beşdarvanek tercîhên xwe yên zewacê wiha kurte dike:

“Mijara baweriyê gelekî girîng e, ez misliman im divê ew jî misliman be. Heke fikra siyasî zêde ne dijber be du mirov dikarin bi hev re derbas bikin, bes divê zêde ne dijber be. Nasnameya nijadî jî girîng e bo min, yanî cudahiya çandê çêdibe ji ber wê.



Ciwanên kurd bi berawirdî nêveka tirkîyeyê naxwazin zû bizewicin. Nêveka tercîha temenê îdeal yê zewacê bo ciwanên kurdan bi 3 salan ji yê nêveka tevahiya tirkîyeyê bilindtir e. Li gel vê yekê, nêveka temenê ciwanên kurd yên zewicî hema bêje bi nêveka tirkîyeyê re wek hev e.

Bi awayekî nêz, temenê zewacê yê hatî plankirin û temenên ku dixwazin bibin xwedî zarok jî gelekî nêzî nêveka tirkîyeyê ye. Li gel vê yekê, tercîha jimareyên zarokan yên ciwanên kurd ji nêveka tirkîyeyê bilindtir e.

GRAFİK 10: TERCÎHÊN ZEWACÊ YÊN CIWANAN



4.6. Nasname

Ciwanên kurd bi parastina nasnameya kurdî re peywendiyê bi nasnameyên gerdûnî re datînin. Di vê navberê de balê dikşînin ser bawerîya olî jî. Nasnameyên misliman û kurd bi awayekî herî berbelav tèn pejirandin. Bi dorê nasnameyên azadîxwazî, welatîyê cîhanê û wekhevîxwazîyê vê dişopînin. Li gel vê yekê, ev nasname têkildarî tercîhên partiyên siyasî dabeşiyeka cuda nîşan didin. Di nav AKPîyan de her ji pênc kesan çar kes nasnameya mislimaniyê dikirpîne, ev kirpandin di nav HPDîyan de ji sisêyan yek, di nav CHPîyan de di rêjeya ji pêncan yekê de ye. Nasnameya kurdî di nav HDPîyan de di rêjeya nêzî ji sisêyan du heb lê xwedî derdikeve, yê AKPîyî ji sisêyan yek vê nasnameyê dikirpîne. Di nav sê partiyên de nasnameya kurdî herî kêr ji hêla CHPîyan ve tê kirpandin. Ciwanên kurd ên HDPîyî û CHPîyî di banda 35-40î xwe azadîxwaz dibînin, ev rêje di nav ciwanên kurd yên AKPîyî de dadikeve heta ji %13an. Kirpandina welatîbûna cîhanê û wekhevîxwazîyê herî zêde li nav ciwanên CHPîyî bihêz e. Ji lewre, di bergehê giştî de kirpandina mislimantiyê ya ciwanên kurd ji AKPîyan, kirpandina kurdîniyê ji HDPîyan, kirpandina azadîxwazîyê ji HDPîyî û CHPîyan, kirpandina welatîbûna cîhanê jî ji CHPîyan tê.


Bi qasî nasnameyên ku tên pejirandin, yê li wan nayên xwedîderketin jî girîng in. Yê ku kirpandina hem kurdbûn, hem oldarbûnê herî kêr e, ciwanên kurd ên CHPyî ne. Nasnameyên welatperwer û welatîyê Komara Tirkîyeyê di nav HDPyîyan de hema bêje qet xwedîtiyê nabîne, ji hêla ciwanên CHPyî bi rêjeyeka qels lê tê xwedîderketin. Di nav ciwanên kurd ên AKPyî ku herî zêde ew vê yekê dikirpînin jî ev rêje nagihêje ji %30î.

TABLO 11: TERCÎHÊN NASNAMEYÊ YÊN CIWANÊN KURD

HILBIJARTINÊN GIŞTÎ YÊN 2018AN				
Hûn dixwazîn bi kîjan nasnameyan bihên qazîkirin?	Yekûn	AK PARTÎ	CHP	HDP
Mislîman	47.6%	80.9%	19.3%	34.5%
Kurd	46.6%	28.6%	17.4%	63.0%
Azadîxwaz	33.8%	13.5%	36.0%	40.7%
Welatîyê Cihanê	33.6%	20.9%	44.3%	33.3%
Wekhevîxwaz	32.7%	26.1%	39.1%	33.4%
Welatîyê Komara Tirkîyeyê	13.1%	27.5%	12.8%	5.4%
Welatperwer	12.5%	28.7%	15.3%	4.4%
Demokrat	10.0%	4.4%	12.9%	12.9%
Şoreşger	7.6%	0.7%	6.0%	10.6%
Sekuler	7.2%	3.6%	20.0%	5.5%
Oldar	6.7%	12.7%	2.4%	5.0%
Sosyalîst	6.6%	1.8%	8.3%	8.5%
Modern	6.0%	5.1%	8.3%	4.2%
Çepgir	5.1%	1.1%	9.4%	6.8%
Muhafazakar	3.8%	8.6%	2.4%	2.1%
Sosyal demokrat	3.0%	1.1%	7.1%	3.6%
Lîberal	1.7%	0.0%	3.6%	1.6%
Elewî	1.6%	0.7%	2.4%	2.1%



GRAFÎK 11: TERCÎHÊN NASNAMEYÊ YÊN CIWANÊN KURD



Tevî ev hemû cudahî û tercîhên heterojen, ciwanên kurd profîleka tirkîyeyî pêşkêş dikin. Ciwanên kurd yê ku li rojavayê ji dayik bûne an jî bi malbatên xwe re koçî rojavayê kirine ji azmûnên xwe û pozîsyonên xwe yê polîtîk serbixwe, bi awayekî çandî bûne tirkîyeyî. Beşeka wan ya girîng, hêvî dikin ku li tirkîyeyê xwe bi jînê ve bigirin. Di rewşa ku heman şert werin dabînkirin ji %30ê ciwanên kurd Diyarbekirê tercîh dikin. Li gel vê yekê Îzmîr bi rêjeya ji %26, Stenbol bi rêjeya ji %24ê eleqeyê dibîne.

Hewlêr di rêjeyeka nêzî ji %4î dimîne. Ango ji xeynî yê ku li welatên xwe dahatûyekê plan dikin, planên piraniya wan zêdetir bo li nav tirkîyeyê û li rojavayê tirkîyeyê ne. Ev rewş tevî ku ne encameka polîtîkaya tirkîyeyîbûnê ya HDPyê ye, polîtîkaya HDPyê û rabêja wê tevkarî kiriye ku ciwan bi vê pozîsyona xwe re li hev bî.

TABLO 12: BI ARMANCA XEBATÊ TERCÎHÊN BAJARAN YÊN CIWANÊN KURD

Ger hûn du teklîfên karî yên ku dê heman mercên jînê dabîn bikin, bistînin, hûn dê ya li ku derê tercîh bikin?	
Hewlêr	3,7%
Stenbol	24,3%
Diyarbekir	30,5%
Wan	8,4%
Îzmîr	26,7%
Enqere	6,4%

Li hêla din tevî ev nasnameya tirkîyeyî jî, ji ber tesîra cudakariya ku jiyane, nêzî nîvê ciwanên kurd naxwazin ku xoşewîstekî wan yê tirk çêbibe. Li gel ku niyet û plana jiyana li tirkîyeyê û sazkirina dahatûyê li bajarên rojavayê heye jî, bilindbûna rêjeyê ya kesên ku naxwazin xoşewîstekî wan yê tirk çêbibe, ji ber ku tesîra

cudakariyê û dîwarên ku wê di navberê de lê kiriye nîşan dide, balkêş e. Ev rewş, nîşan dide ku bi giştî kurd bi taybet jî ciwanên kurd li bajarên rojavayê yên ku lê dijîn xwedî habîtateka kurdan e û hebûna habîtateka wiha dûrbûnê hêsan dike.

4.7. Tercîhên Jiyana Civakî

Ciwanên kurd di mijarên wekî zayenda civakî, azadiya baweriyê de xwedî helwesteka azadîxwaz in. Nêzî ji %65ê ciwanan dibêjin ku jin dikarin di saeta ku dixwazin de derkevin derve, nêzî ji %58ê wan piştigiriyê didin ku cembaxane wekî îbadetxane werin qebûlkin. Rêjeya yên ku piştigiriyê bo mecbûriyeta dersên olê û yên ku qedexebûna kurtajê diparêzin di %30î de dimîne. Li gel vê yekê ev tercîh jî xwedî qerekerê heterojen e. Helwesta ciwanên kurd yên ku xwedî tercîhên cuda yên siyasî ne jî, diguhere. Serqise yên piştigirî dikin ku jin di saeta ku dixwazin derkevin derve de bi piştigiriyê rêjeya ji %80î re ji CHPyîyan û bi piştigiriyê ji %73an ve ji xortên HDPyîyan pêk tê. Bi awayekî nêz, yên piştigirî dikin ku cembaxane wekî îbadetxaneyan werin naskirin jî bi rêjeya nêzî ji %70yî ciwanên CHPyî û yên HDPyî ne. Ji %37ên ciwanên kurd yên AKPyî piştigiriyê didin ku cembaxane wekî îbadetxaneyan werin naskirin, ji %60î wan jî li gel wê yekê ne ku dersên olî mecbûrî bin. Li gel vê, tona alîgiriya azadiyê ya ciwanên kurd bi rêjeya mezin hilbijêrên CHP û HDPyî pêk tînin.

Dema ji hêla herêmî ve tê nixandî, em dibînin ku ciwanên ku li rojavayê dijîn bi berawird li yên bajarên ku nifûsa kurdan lê pir e dijîn, di pozîsyoneka vekirîtir de ne. Jin, di sernavên hemû mijaran de an bi qasî mêran an jî ji mêran zêdetir azadîxwaz in.

Bi taybetî di mijarên wekî kurtaj, beşdariya jinê li jiyana karî ku rasterast jinan eleqedar dike de helwesta jinan ya azadîxwaz zahf zêdetir eşkere dibe. Ji lewre bi tercîhên siyasî, bajarê ku lê tê jiyîn û zayend jî wekî kategoriyên ku di derbarê meseleyên civakî de helwesta ciwanan dibire, derdikeve pêşberî me.



TABLO 13: TERCÎHÊN CIVAKÎ YÊN CIWANÊN KURD

HILBIJARTINÊN GIŞTÎ YÊN 2018AN				
	Yekûn	AK PARTÎ	CHP	HDP
Divê jin bikaribin di saeta ku dixwazin de derkevin derve	64.6%	38.2%	79.8%	72.5%
Divê cexxane wekî îbadetxaneyê were naskirin	58.4%	36.8%	67.0%	70.9%
Xwendekar dikarin mêr-jin di heman malê de bimînin	37.3%	5.6%	45.7%	51.4%
Mecbûriyeta darsa olê di cih de ye	30.2%	60.5%	14.9%	18.8%
Naxwazim xwarinê li restoranên ku araq lê tê vexwarin, bixwim	29.0%	52.6%	12.8%	17.9%
Divê kurtaj qedexa be	28.5%	50.3%	14.9%	19.7%
Divê yasayên dewletê guncaw be li Qur'anê	27.2%	51.6%	10.6%	15.6%
Heke li cihekî pirsgerêka îstihdamê hebe, kar kêma be divê beriya jinan kar bo mêran were dayîn	21.5%	38.5%	6.4%	15.2%
Jin bi tenê dikarin li cihên ku temasî jinan dikin bixebitin	10.5%	18.4%	4.3%	7.5%
Heke ji malbatekê dê zarokek bikaribe biçe lîse/zanîngehê, divê zarokê xort biçe	7.9%	12.8%	4.3%	5.9%

	YEKÛN	PARÊZGEH (2LIBÎ)		ZAYEND	
		HERÊM	ROJAVA	JIN	MÊR
Divê kurtaj qedexa be	2.42	2.75	1.91	2.33	2.51
Naxwazim xwarinê li restoranên ku araq lê tê vexwarin, bixwim	2.39	2.60	2.06	2.43	2.35
Divê yasayên dewletê guncaw be li Qur'anê	2.45	2.67	2.10	2.41	2.49
Mecbûriyeta darsa olê di cih de ye	2.49	2.69	2.18	2.53	2.45
Heke li cihekî pirsgerêka îstihdamê hebe, kar kêma be divê beriya jinan kar bo mêran were dayîn	2.08	2.40	1.59	1.89	2.26
Heke ji malbatekê dê zarokek bikaribe biçe lîse/zanîngehê, divê zarokê xort biçe	1.49	1.63	1.27	1.34	1.63
Jin bi tenê dikarin li cihên ku temasî jinan dikin bixebitin	1.64	1.80	1.40	1.42	1.84
Divê cexxane wekî îbadetxaneyê were naskirin	3.64	3.56	3.76	3.57	3.70
Xwendekar dikarin mêr-jin di heman malê de bimînin	2.75	2.56	3.03	2.69	2.80
Divê jin bikaribin di saeta ku dixwazin de derkevin derve	3.84	3.76	3.97	4.16	3.55

	YEKÛN
Divê jin bikaribin di saeta ku dixwazin de derkevin derve	3.84
Divê cexxane wekî îbadetxaneyê were naskirin	3.64
Xwendekar dikarin mêr-jin di heman malê de bimînin	2.75
Mecbûriyeta darsa olê di cih de ye	2.49
Divê yasayên dewletê gunçaw be li Qur'anê	2.45
Divê kurtaj qedexa be	2.42
Naxwazim xwarinê li restoranên ku araq lê tê vexwarin, bixwim	2.39
Heke li cihekî pirsgerêka îstihdamê hebe, kar kêma be divê beriya jinan kar bo mêran were dayîn	2.08
Jin bi tenê dikarin li cihên ku temasî jinan dikin bixebitin	1.64
Heke ji malbatekê dê zarokê bikaribe biçe lîse/zanîngehê, divê zarokê xort biçe	1.49

TABLO 14: MESAFIYÊN SOSYAL YÊN NASNAME BINGEHÎ YÊN CIWANÊN KURD

	BILA NEBE MAMOSTEYÊ MIN	BILA NEBE ŞARE DARÊ MIN	BILA NEBE XOŞEWÎSTÊ MIN
Mensûbê terîqetê, sofî	83.4%	85.1%	89.6%
Hevzayend	77.6%	77.8%	85.0%
Ateîst	66.9%	68.7%	72.5%
Suriyeyî	61.7%	67.5%	67.1%
Ereb	52.4%	58.8%	59.3%
Ermen	45.8%	50.9%	51.4%
Tirk	42.8%	47.0%	44.0%
Rûm	36.5%	45.6%	40.3%
Emerîkan	35.9%	42.9%	40.1%
Japon	30.6%	39.2%	39.9%
Norwecî	29.5%	39.1%	39.2%
Elman	29.3%	38.8%	36.2%
Elewî	18.4%	23.8%	35.1%
Sergirtî	18.1%	14.9%	35.0%
Jin	9.1%	11.8%	34.4%



Helwesta azadîxwaz ya ciwanên kurd ya ku diteyise bergeha giştî, xwe di mesafeyên bo nasnameyên cuda de nîşan nade. Toleransa ciwanan bo nasnameyên cuda zahf kêr e. Bi taybetî naxwazin ku kesên xwedî nasnameyên, endamê terîqetê, hevzayend, ateîst, sûriyeyî, bibin mamoste, şaredar an jî xoşewîstê wan. Nihêrîna neyînî ya li dij van nasnameyan di ser ji %50î ra ye û bo hinekan derdikeve heta ji %80yan. Nêzî nîvê ciwanan naxwazin yekî ermen, ereb û heta tirk bibin mamoste, şaredar an jî xoşewîstê wan. Têgihana ciwanên kurd ya têkildarî nasnameya erebî li gel tesîrgirtina pêla neyînî ya têkildarî penaberan bilind dibe, bi taybetî tesîra jiyîna bi hev re ya li cihên wekî Mêrdîn û Rihayê ku dibe sedema tansiyona etnîk û siyasî jî tê hestkirin.

Tercîhên mesafeya civakî ya ciwanan jî bi tansiyonên siyasî re di nav hev de ne. Ciwanên ku hilbijêrên CHP û HDPyê ne, bo endamên terîqetan zêdetir bi mesafe ne, ciwanên AKPyî bo hevzayend û ateîstan bi mesafetir in. Yê AKPyî bo ermenan zêde bi mesafe ne, bo CHPyîyan ev nasname dibe sûriyeyî, bo HDPyîyan jî dibe tirk. Bi her awayî, beyanên azadîxwaz yê di beşa berî vê de hat nîqaşkirin di pratîkê de beramberiya van, bi bêtoleransiyeke gelekî tevlihev û bifekar tê pêşwazîkirin.

HILBIJARTINÊN GIŞTÎ YÊN 2018AN				
naxwazim yekî ... bibe mamosteyê min	YEKÛN	AK PARTÎ	CHP	HDP
Mensûbê terîqetê, sofi	83.4%	70.9%	91.1%	90.7%
Hevzayend	77.6%	89.9%	70.8%	78.4%
Ateîst	66.9%	86.8%	60.0%	62.3%
Suriyeyî	61.7%	76.8%	84.6%	65.0%
Ereb	52.4%	50.0%	56.5%	63.0%
Ermen	45.8%	74.7%	50.0%	37.5%
Tirk	42.8%	34.1%	9.1%	63.6%
Rûm	36.5%	58.7%	41.2%	36.7%
Emerîkan	35.9%	61.9%	35.7%	29.2%
Japon	30.6%	52.8%	30.8%	32.4%
Norwecî	29.5%	53.7%	40.0%	26.5%
Elman	29.3%	56.1%	35.7%	23.9%
Elewî	18.4%	43.2%	16.7%	15.0%
Sergirtî	18.1%	9.4%	28.6%	27.8%
Jin	9.1%	9.4%	9.1%	13.1%

HILBIJARTINÊN GIŞTÎ YÊN 2018AN

naxwazim yekî ... bibe şaredarê min	£	AK PARTÎ	CHP	HDP
Mensûbê terîqetê, sofî	85.1%	76.4%	90.9%	91.9%
Hevzayend	77.8%	91.6%	70.8%	78.5%
Ateîst	68.7%	80.9%	87.9%	69.5%
Suriyeyî	67.5%	86.2%	55.0%	62.6%
Ereb	58.8%	69.9%	54.5%	66.2%
Ermen	50.9%	78.4%	52.9%	43.5%
Tirk	47.0%	31.7%	23.1%	69.6%
Rûm	45.6%	72.7%	61.1%	37.2%
Emerîkan	42.9%	68.6%	41.2%	37.8%
Japon	39.2%	66.7%	42.9%	31.9%
Norwecî	39.1%	66.2%	46.7%	31.5%
Elman	38.8%	65.2%	38.5%	33.3%
Elewî	23.8%	50.0%	16.7%	15.0%
Sergirtî	14.9%	3.3%	33.3%	27.9%
Jin	11.8%	12.5%	9.1%	17.5%

HILBIJARTINÊN GIŞTÎ YÊN 2018AN

Naxwazim yekî ... bibe xoşewîstê min	YEKÛN	AK PARTÎ	CHP	HDP
Mensûbê terîqetê, sofî	89.6%	93.8%	95.6%	91.4%
Hevzayend	85.0%	74.7%	91.0%	91.8%
Ateîst	72.5%	86.9%	65.2%	70.9%
Suriyeyî	67.1%	78.9%	86.1%	67.7%
Ereb	59.3%	68.4%	58.3%	69.5%
Ermen	51.4%	76.8%	43.8%	45.3%
Tirk	44.0%	68.9%	50.0%	38.8%
Rûm	40.3%	20.0%	9.1%	64.8%
Emerîkan	40.1%	33.3%	50.0%	56.6%
Japon	39.9%	64.7%	42.9%	40.0%
Norwecî	39.2%	69.4%	43.8%	33.8%
Elman	36.2%	63.2%	30.8%	32.4%
Elewî	35.1%	50.0%	50.0%	39.5%
Sergirtî	35.0%	64.2%	30.8%	31.4%
Jin	34.4%	58.3%	43.8%	32.4%



PIRSGIRÊKÊN
BINGEHÎN Û
TERCÎHÊN SIYASÎ

5 Pirsgirêkên Bingehîn û Tercîhên Siyasî

5.1 Koç

Di jiyana ji nîvî zêdetir ya ciwanên kurd de azmûna koçê heye. Nîvê kesên ku koç kirine diyar dikin ku wan bi tenê koç kirine. Li hêla din ji her 5 beşdarvanan 2 hebên ku li parêzgehên rojavayê tirkîyeyê dijîn, li rojavayê ji dayik bûne û li wir mezin bûne. Dîsa ji her 5 ciwanan 1ê wan ji 10 salan zêdetir e ku li vî bajarî dijîn. Piraniya seretaya ciwanan parve dikin ku wan ji bo karî an jî perwerdehiyê koç kirine.

TABLO 15: DEMOGRAFIYA KOÇÊ YA CIWANÊN KURD

Azmûna jiyîna li gund an jî bajarokê				
Qet nejiyame		57,5%		
1-10 sal		23,4%		
11 sal û jorî wê		19,1%		

Çend sal e li bajêr dijî	YEKÛN	HERÊM	ROJAVA
10 sal û jêrî wê	34,5%	31,1%	39,8%
Ji 10 salî zêdetir	17,9%	16,4%	20,3%
Ji dema ku çêbûme li vî bajarî dijîm	47,6%	52,6%	39,8%

Sedema koçkirinê	YEKÛN	HERÊM	ROJAVA
Tenduristî û zewac	6,5%	8,2%	4,5%
Perwerdehî	42,9%	41,8%	44,2%
Kar	44,8%	41,8%	48,4%
Afetên xwezayî / pevçûn / koça mecbûrî	5,8%	8,2%	3,0%

Bi kê re koçî bajêr kiriye	ROJAVA
Tenê / Bi hêvalên xwe re	49,1%
Bi malbata xwe re	50,9%



Diyardeya koçê bi şêweyên têvel tesîrê li gelek tiştên jiyana ciwanan dike. Ji yana ciwanên ku li rojavayê çêbûne an jî beriya gelek salan koç kirine, bi piranî li dibistanê, li karî, di têkiliyên hevaltiyê de bi dîtina ewil re serpehatiya “bibîrxistina kurdbûna wan” dest pê dike. Ciwanên ku tim û tim bi jiyînê azmûn dikin ku “ne ji wê derê ne”, ji welatê xwe dûr, bi hesta dûrketinê jî halekî “bihevrebûnê” dijîn. Ji lewre koçberî û cudakarî tevîhev dibe û bi hev re didome. Beşdarvanek vê rewşê wiha kurte dike:

“*Ji ber ku zêdetir dema xwe li stenbolê derbas dikim, zêdetir xwe wek kesek stenbolî hest dikim, zarokatiya min li elbakê jî derbas bûye, ji ber ku xizmên min li wir in, bêriya wê derê jî dikim.*”

Li hêla din ji hêla aborî ve pêdiviya xwegirtina bi bajarê ve, berê ciwanan dide wê yekê ku bo girtinê li sedeman bigerin. Ciwan di vê lêgerînê de temasî cemaetên îslamî, hawîrên çanda populer, hawîrên ku ji ciwanên kurd pêk tînin, dikin û hewl didin wiha xwe lê bigirin. Bi taybetî li bajarên koçê, ciwan tîmên futbolê yên wî bajarî bo xwegirtina li wî bajarê wekî amrazekê diemilînin. Edene û Îzmîr wekî du bajarên ku amrazên “xwelêgirtinê” tînin emilandin, derdikevin pêş. Mînakên li jêr vê meylê dityesin:

“*Göztepeya ku tîma Îzmîrê ye digirim. Tîma min ya duyem Galatasaray e. (Îzmîr, jin)*”

“*Karşıyakayê digirim. Tîmeka min ya duyem nîne. (Îzmîr, mêr)*”

“*Göztepeyê digirim. (Îzmîr, mêr.)*”

“*Galatasaray, ya duyem jî ji ber ku li vira me, Göztepe. (Îzmîr, mêr)*”

“*Ji biçûktiya xwe de ji Fenerbahçeyê hez dikim. Wekî herêmi Edenesporê û Edene Demirsporê digirim. (Edene, mêr)*”

“*Ji ber ku populer e Galatasarayê digirim, tîma min ya duyem Edene Demirspor e.*”

Li gel vê yekê ciwanên ku li welatên xwe dijîn heke têkildarî futbolê bibin Amedspora nasnameyeka herî bi dest xistiye digirin û heke populer be tîma bajarên xwe digirin. Lê belê ji ber ku amrazekê ku pêwendiya welatê wan didomînin û ji ber bêriya bo welatê wan temsîl dikin, ciwanên kurd tîmên welatê xwe jî digirin û wan teqîb dikin.

Niyet û arezûya vegeerê ya ciwanên ku li parêzgehên koçê ne, têkildarî rewşa sosyo-ekonomîk ya bajarên ku niha lê dijîn, diguhere. Ciwanên ku xwedî dahateka kêma in dixwazin vegeerî welatê xwe bes yê çîna navîn an jî çîna jortir xwedî tesewirek wiha ne ku bajarê koçê yê ku li dijîn dixin navendê. Ev mînak vê trendê kurte dikin:

“ *Wiha difikirim ku ez dê bi awayekî rehetir li Diyarbekirê bijîm. Niha wekî xebat li Îzmîrê dijîm bes heke derfeta min hebûya ku karê ez difikirim bikim, ez dê rasterast li Diyarbekirê bijiyama, nedihatim vê derê. (Îzmîr, Mêr)*

“ *Dixwazim li Mêrdînê bijîm bes ji ber ku derfetên karî yên vê derê baştir in em li vir dijîn. (Îzmîr, jin, xebatkara tekstîlê)*

“ *Heke kar hebûya, bi her awayî dê rojhilat bûya, min dixwest li cihê ku ji dayik bûm bijîm. Jiyîna li Şirnexê, li welatê xwe, ya herî xweş e... (Stenbol, mêr, karker)*

“ *Ji ber ku welatê min e, ji ber ku li wê derê azadtir im. Dixwazim li Diyarbekirê bijîm. (Stenbol, mêr, karker)*

Wiha dixuyê ku di nav ciwanên ku li rojavayê ji dayik bûne û li wir dijîn de yên ku peywendiya wan bi welatê wan re qut bûye jî, ev pênc salên dawî welatê xwe meraq dikin, dest bi gera wê derê kirine. Di heman serdemê de lihevhatina bi kurdbûnê û şermkirina ji nezanîna kurdî jî xwe nîşan daye. Kurdbûn di vê serdemê de ji tiştekî ku ji derve ve tê bibîrxistin û li dijî wê bi reflekseka reaksiyoner tê hembêzkerin wêdetir, vediguhere nasnameyeka ku ji nû ve tê keşfkirin. Tê dîtîn ku encama herî diyar ya serencama ku bi pêvajoya çareseriyê re dest pê kiribû û bi rêjeya dengên ku HDPyê di hilbijartinên 7ê Hezîranê de bi dest xistibû, bilindbûna hişmendiyê kurdî ye. Wekî destkefta herî şênber ya vê serdemê, meşruiyeta nisbî ya kurdî bi dest xistibû û kurdbûna ku bûye “kinceka ku li gel heznekiran jî tê lixwekirin”, dikare were gotin.

Hem azmûna ku tecrubeya koçê dabû jiyîn hem jî pêvajoya ku ji çareseriyê siyasî bi awayekî rûxîner veguhezîbû pevçûna çekdarî, li gel ku hawîra hestiyar ya di navbera 2013-15an de belav kir jî lixwekirina kurdbûnê ji ber ku wekî “cinê ji şûşe derdikeve”ne pêvajoyeka ku dikare bi paş de were vegerandin, tesîrên neyînî li têkiliyên wekî hevaltî û xoşewîstiyê jî dike, cudakariyê tevdigerîne. Cudakarî û bi tesîra hawîrên civakî yên ku ji hêla kesên maruzî cudakariyê mane, hatine saz kirin, mesafeya civakî ya ciwanên kurdan di navbera yên din de zêde dibe. Ji nav ciwanên kurd yên koç kirine û dibêjin “bila xoşewîstekî min yê tirk çênebe” yên ku maruzî cudakariyê mane zêde dixuyên. Du beşdarvan wiha vedigêrin:

“ *Qet bi kesek tirk re flortê nakim. Ereb, ermen, suryan dibe bes tirk nabe. (Jin, Stenbol)*

“ *Di têkiliya dumendî de, heke rewşeka ku bi taybetî bifikirim bizewicim hebe di vê rewşê de ahenga çandî pêwîst dibe. Îdeolojî li hêlekê bes helwesta ji %90ê tirka bo kurdan diyar e. Bi min wekî çandî, binyata malbatê, mijarên olî di zewacê de girîng in. (Mêr, Îzmîr)*



5.2 Cudakarî

Di mijara pirsgirêkên tirkîyeyê yê wekî bêkarî, aborî, edalet û perwerdiyê de li hev bikin jî pirsgirêka kurd, ciwanên kurd ji yê din cuda dike. Her ji 10 ciwanan nêzîkî 7ê wan diyar dikin ku kêma an jî zêde tûşî cudakariyê bûne. Dema li lêkola ciwanîyê ya Next Generation Tirkîyeyê² tê nihêrîn, di tevahiya tirkîyeyê de rêjeya ciwanên ku dibêjin em tûşî cudakariyê bûne ji %5 e. Di nav ciwanên kurd de rêjeya yê ku dibêjin em tim tûşî cudakariyê dibin jî du qatî ji vêya zêdetir e. Ev rewş nîşan dide ku ciwanên kurd di jiyana rojane de bi zahfî tûşî cudakariyê bûne û mecbûr mane ku bo seredekarîkirina bi cudakariyê re zêde dema xwe xerc bikin û hewl bidin. Ciwanên kurd herî zêde di hawîra zanîngehê de tûşî cudakariyê dibin.


“ Ez gelek caran tûşî cudakariyê bûm. Di dibistana navîn de rojekê di dersekê de, wê demê mufetîş tim dihatin û diçûn û bi xwendekaran re diaxivîn. Mufetîşek çawa ket polê di lîsteyê de navê min (yê bi kurdî) dît. Xwest bizanibe ka kî me, ez jî hatim ber texteyê. Ez zarokeka jixwe bawer bûm. Bi awayekî rehet hatim ber texteyê, wiha fikirîm ku ez ê bersiva pirsan bidim. Ji min pirsî ku bavê min kî ye û vê pirsê ez ecêbmayî hiştibûm. Min got qey bavê min dinase. Min behsa bavê xwe kir. Di nivê axaftinê de gotina min qut kir û berê min dabû texteyê û gotibû serê xwe bilind bike. Dema min serê xwe bilind kir bi Ataturkî rû bi rû mabûm û gotibû bavê te ew e. Niha jî, wê demê jî min nezanîbû çî bibêjim. (Jin, Stenbol)

“ Bo nimûne heke tu li Sêwasê xwendekar bî, wekî ku her xwendekarekî kurd tûşî wê dibe, heke tu li kampusê bi kurdî biaxivî, rojtira din rêya te tê birîn, an tu têyî hişyarkirin an jî... (Mêr, Mardin)

“ Li hember vê rewşê her nasnameya me ya kurdî li pêş e, yanî çî zanim, dema hîn dibin ku tu kurd î an jî ji rojhilatê hatiyî her tim helwesteka cuda bo te tê pêşandan. Mînaka herî xerab, bo nimûne [li rojavayê] li wargeha zanîngehê dimam. Li wê derê hevalên ‘ülküçü’ diketin odeyê û min gotinên wekî “em li vê derê kurdan naxwazin” bihîstin. An jî li kargeha ku ez ketibûmê, mişteriyê ku hat, bi tenê ji ber hîn bû ku ez kurd im, çû ba patronî û xwest min ji kar bavêje, min ev bihîst. Yanî ev rewş, mijarek e ku em her girêdayî nasnameya xwe dijîn. (Mêr, Wan)

2. Next Generation Türkiye: Gençlerin Sesini Dinlemek (Guhdarkirina Dengê Ciwanan), Yaşama Dair Vakıf, İstanbul, 2017. <https://yada.org.tr/yayinlar/next-generation-turkiyedeki-genclerin-sesi-arastirmasi/>

TABLO 16: AZMÛNA CIHÊKARIYÊ YA CIWANÊN KURD



AZMÛNA CUDAKARIYÊ	HERÊM	ROJAVA	YEKÛN
Na qet çênebû	65,8%	34,2%	100%
Zahf kêmbê jî dibe	61,8%	38,2%	100%
Carna dibe	60,1%	39,9%	100%
Gelek caran dibe	50,5%	49,5%	100%

Ciwan difikirin ku li rojavayê di eleyhê kurdan de pêşdarazek heye û ji ber vê yekê tûşî cudakariyê bûne. Sedema vê pêşdarazê û cudakariyê jî bi wê yekê girê didin ku rêzefilmên TVyên tirkan, kurdan bi awayekî xelet didin nasîn. Her wiha medyaya civakî wek yek ji wan cihên ku cudakarî zêde lê derdikeve, tê dîtin. Cudakariya di werzîşê de ya ku bi avabûna Amedsporê re diyartir bû jî tê zimên. Beyanên beşdarvanan wiha ne:

“ Ez Diyarbakırsporî me, li cihê ku em çûn deplasmanê av nefirotin me. (Diyarbakır, mêr)

“ Em bi malbata xwe re bo betlaneyê çûbûn behra reş. Garson bi rûkenî pirsî ku em ji kû derê ne. Dema me got Diyarbakır, îfadeya di rûyê wî de guherî. Rûyê wî daliqî. Bêyî ku tişteki bibêje, çû. (Diyarbakır, jin)

“ Heke di medyaya civakî de tişteki têkildarî kurdan bûbe rojev teqez tiştên xerab tèn nivîsîn. (Edene, mêr)

“ 2-3 mirov bo vîdyoya danasîna Edeneyê diaxivin, li navçeya Yüreğirê ne filan.. kurik li binê nivîsiye, ‘vana bi eslê xwe ne ji Edeneyê ne, Edeneyîyê rastîn be wiha nake, evana mirovên ku ji rojhilatê hatine.’ Kêfa min jî jê re nehatibû, çiku yek ji wan jî bi awayekî mecbûrî neçûne Edeneyê. Ji mecbûrî ji vir hatin koçkirin. (Mêrdînî, li mêrsînê xwendekar, mêr)



“ Dema dixwazim xanî bigirim dipirsin ka ji ku derê me. Dema dibêjim ji Mêrdînê me, ‘normalde em nadin Mêrdîniyan’ dibêje. An jî dibêjin ma tu ji Sûriyeyê yî. (Edene, mêr)

“ Li dibistana ku lê dixebitim navbera min bi her kesî re baş e. Lê belê bo nimûne dema êrîşa Oremarê çêbû bi taybetî li pêş çavê min dijûn ji reh rîşalan re didan. (Stenbol, jin)

“ Dema dibêjin tu ji ku derê yî, dibêjim ji Çewlîgê me, dibêjin waa lê tu qet naşibî wan. Ev tişt ew qas rûniştîye ku difikirin ku li gor xwe tişteki baş ji min re dibêjin. Ma bo çi şibîna kurdan dê tişteki baş be? (Stenbol, mêr)

Jiyîna krîzekê di derbasbûna ji “kurdûna çandî” berev “kurdûna polîtîk” ve diteyise beyanên ciwanên ku ev derbas bûn jiyane. Ciwanên ku paşê nasnameya kurdî naskirine an jî paşê wateyeka polîtîk lê bar kirine, vedigêrin ku bertekên têkildarî kurdûnê azmûn kirine ka çawa guherîne. Ev ciwan radigihînin ku heke kurdûn tişteki nediyar be zêde nabe pirsgerêk bes gava tê dîtî an jî tê nîşandan, pirsgerêkan dijîn:

“ Heta ez çûm zanîngehê ez hinekî di hawîrên muhafazakar de mam. ...heta lîse qediya kurdeke maqûl bûm. Berxwedêriyeka min ya têkildarî kurdûna min tunebû. Rewşa min ya zimanê xwe, çanda xwe, jiyana xwe biteyisînim, tune bû. Di vê rewşê de tûşbûna zêde bo cudakariyê ne pêkan bû. Çiku jixwe êdî hûn di nav dînikê de jiyaneka tirkbûyî berdewam dikin. Ji ber wê yekê tu nakî pirsgerêk. Lê belê serdema min ya zanîngehê hinekî cuda bû, li wir min hinekî xwe li kurdûna xwe girt. Dema wiha dibe mesele diguhere. Bo nimûne di merasimên mezûniyetê de bi hemû zimanan silav dihate dayîn, min jî li şandeya facebookê bo komîteya salnameyê nivîsî, ‘kurdî jî lê zêde bikin, hûn dikarin bi vî awayî bibêjin.’ Ev tişt, bo min tişteki gelekî ji rêzê bû di wê serdemê de. Rojtira din ji nişkê ve bi tiliyan hatim nîşandan. Hûn çiqasî li zimanê xwe, li çanda xwe xwedî derdikevin, li tirkîyeyê hûn ewqasî tûşî cudakariyê dibin. Ev hê jî wiha ye. (Jin, Stenbol)

“ Bi piranî heke hûn li bajarekî anatolyaya navîn bibêjin ez kurd im, an jî gotina çend peyvên kurdî jî tavi lê dê we tûşî cudakariyê bike. Carna em tayîna xwe dixwazin. Diyarbekir an jî Stenbol dibêjim. [Li rojavayê] Dibêjim anca Stenbol dikare rake. Çiku ez li kolanê, li parkê, li bazarê her dem bi keça xwe re bi kurdî diaxivim. Û mesela ez dibêjim, ti bajarekî anatolyaya navîn nikare vêya rake. Ez dê nikaribim rehet bijîm, her dem dê çavek li ser min hebe. Mesela ev hemû yek bi yek cudakarî ne ya rast. Îllim hewce nake ku heqaretê li we bikin awir jî carna cudakariyek e. (Jin, Stenbol)

Rewşa tevahî ya bextewariya ciwanan têkildarî asta marûzbûna cudakariyê diguhere. Yên ku asta wan ya bextewariyê herî nizm e, ew kes in yê dibêjin ku her tim tûşî cudakariyê dibin. Ciwanên ku li parêzgehên rojavayê dijîn, difikirin ku zêdetir tûşî cudakariya şexsî dibin bes ciwanên ku li parêzgehên kurdan dijîn difikirin ku mexdûrê cudakariyeka kolektîf ya dewletê ne.

Mêr bi awayekî hewl didin ku bi awayekî serederiyê li cudakariyê bikin, jin ji ber “hem jin hem kurd”bûnê mecbur in ku serederiyê li cudakariya ku tûşî wê dibe, bikin ku kûrtir e û pirhêl e.

“*Dijwariyeka ku em dijîn heye. Nasnameya min ya etnîkî ji destpêkê ve pirsgirêk e. Lê belê xemên min ku ji xeynê vê dijîm, hene. Wek tewaciz, tecawizên zarokan. Eyn wekî tecawizkarê ku derxistine bo celseyê û zarokan. Fikra vê jî zahf tirsnak e. Ez ji ber van zarokan xemên gelek mezin hildigrim. Bo jinan jî heman tişt derbasdar e. Dema ku hinek kes wenda dibin bêyî cudahiya temenî, tiştta ku ewil tê hişê me tecawiz e. Ev jî tişttek e ku qelbê mirov nikare ragire. Xema min ya herî mezin di vê mijarê de ye. Pirsgirêkên aboriyê an jî tiştên jê cudatir dikarin werin îdarekirin lê tiştên bi vî rengî min gelekî xemgîn dikin. (Stenbol, jin)*

“*Wiha difikirim ku li rojhilatê û li başûrê rojhilatê jinek nîne ku bibêje ji hêla zayendê ve tûşî cudakariyê nebûme. Kesên ku ji hêla aboriyê rewşa wan baş e jî, heke ji hêla malbata xwe nebe jî ji hêla civakê ve tûşî cudakariyê dibe. Çiku em di civakeka baviksalar de dijîn. Em zêdetir li rojhilatê hest bi vê yekê dikin. Ji ber ku em dixwînin, ji ber tiştên ku em dikin. ya rast em bi mêran re heman tiştî dikin bes dema ku jin dikin tê çavên civakê. Ji bilî wê car caran dema em diçin parêzgehên rojavayê, ji ber fikrên xwe yê siyasî em tûşî cudakariyan dibin. (Diyarbakir, jin)*



5.3. OI

Berovajî qenaeta giştî ya têkildarî oldartirbûna kurdan, dîteyên lêkolînê, piştgiriya fikra ku dibêje ciwanên kurd, ji ciwanên din oldartir e, nake. Ciwanên kurd di mijara oldarbûnê û bicihanîna rituelên olî ve bi nîveka giştî ya tirkîyeyê re hevşibîyan nîşan didin. Li gel vê yekê wekî tê hêvîkirin di tîkiliya oldarbûnê û partiyê de kolerasyonek heye: rêjeya nimêjkirinê ya kesên ku dengê xwe didin AKPyê bilindtir e. Ji sê ciwanên ku dengê xwe didin AKPyê nêzî du hebê wan û ji çar ciwanên ku dengê xwe didin HDPyê ji yekê zêdetir diyar dikin ku tim nimêj dikin.

TABLO 17: PRATÎKÊN DÎNÎ YÊN CIWANÊN KURD

		MÎNAKDAN	TIRKIYE
Sergirtîbûn	Sergirtî	47.6%	27.7%
	Ne sergirtî	52.4%	72.3%
Nimêj	Her û her	36.9%	37.1%
	Carna	45.1%	48.9%
	Ti carî	18.0%	14.0%

NIMÊJ	AK PARTÎ	HDP
Her û her	62.5	27.0
Carna	33.9	49.7
Ti carî	3.6	23.3

Yên ku li bajarên kurdan dijîn ji yê koçî rojavayê kirine, yê zewicî ji yê azib, yê bi malbata xwe re dijîn ji yê ku bi hevalên xwe re an jî bi tenê dijîn, yê ku li malbatên qerebalix dijîn ji yê din, yê ku demek dirêj li gund jiyane ji yê ku kêmtir jiyane, yê ku rewşa wan ya aborî nizm e û yê dahata wan kêmtir profîleka oldartir ji yê dahata wan bilind e, nîşan didin.

Wekî rêberî qenaeta olî yê ku ciwanên kurd navê wî zikir dikin bi ferqeka mezin Seîdê Nûrsî ye. Bi awayekî kêmtir navên wekî Ali Şerîatî, Malcolm X û Mustafa Îsmaoğlu wî dişopînin. Kêmtir be jî navê Îhsan Eliaçık, Nurettin Yıldız, Caner Taslaman û Alparslan Kuytul jî tên bilêvkirin.

Li hêla din rêjeya kesên ku baweriyê bi tu olê nayînin li gorî nîveka tirkîyeyê di nav ciwanên kurd de gelekî bilind e, ji %17,5. Li gor daneyên Kondayê; di tevahiya tirkîyeyê de di tevahiya hemû komên temenî de rêjeya yê ku xwe wekî bêbawer pênase dikin ji sedî 3 ye, li gor heman daneyan ev rêje di nav hîlbijêrên HDPyê de wekî ji sedî 11an hatiye tesbîtîkirin. Li hêla din li gorî Di Tevahiya Tirkîyeyê Lêkolîna Ciwanîyê ya ku MAK Danîşmanlıkê di 2020an de kir, rêjeya ciwanên ku ne xwedî tu baweriyê ne wekî ji sedî 7,7 hatiye parvekirin, rêjeya yê ku bawerîya wan ya axîretê nîne wekî ji sedî 11,7 tê qeydkirin.

Nasnameyên wekî ateîst, deîst, agnostîk di nav ciwanên kurd yê nêzî AKPyê de kêmtên dîtin bes ji çar heban yek jê ciwanên kurd yê ku nêzî CHP û HDPyê ne xwe bi van nasnameyan pênasê dikin. Bi giştî ji çar ciwanên ku vê yekê dikirpînin sê hebê wan xwe nêzî HDPyê dibînin. Di nav ciwanên HDPyê de bi berawird pîveka tirkîyeyê zêdebûna dûrketina ji olê, di peywendê têkiliya di navbera îdeolojiya siyasî û bawerîya olî de, balê dikişîne. Ev dîte qenaeta giştî ya ku bo ciwanên ku nêzî siyaseta kurdî ne û bi HDPyê tîm temsîlîkirin, dibêje “ji olê dûr dikevin û sekuler dibin” bi awayekî qismî teyîd dike. Sekulerbûn di ciwanên kurd de bi berawird ciwanên din, xwe wekî pêvajoyeka leztir didome nîşan dide, tê dîtin ku lezgînbûna nav nîşan ya sekulerbûnê jî bi helwesta siyasî re têkildar e.

TABLO 18: TERCÎHÊN OLÎ YÊN CIWANÊN KURD

Ji hêla baweriyê ve hûn xwe çawa pênasê dikin?	TOTAL	PARÊZGEH (ZLIBÎ)		ZAYEND	
		HERÊM	ROJAVA	JIN	MÊR
Sunî	12,6%	13,6%	11,1%	9,7%	15,2%
Heneffî	19,4%	22,0%	15,3%	23,0%	16,1%
Şafî	47,0%	51,7%	39,7%	48,1%	46,0%
Elewî/Ceferî/Şîî	3,7%	1,6%	7,0%	4,1%	3,2%
Ateîst/Agnostîk/Deîst/Hemû	17,3%	11,1%	27,0%	15,0%	19,4%

HILBIJARTINÊN GIŞTÎ YÊN 2018AN				
Ji hêla baweriyê ve hûn xwe çawa pênasê dikin?	TOTAL	AK PARTÎ	CHP	HDP
Sunî	12,6%	19,4%	13,8%	11,0%
Heneffî	19,4%	34,2%	21,3%	10,2%
Şafî	47,0%	45,1%	38,3%	49,2%
Elewî/Ceferî/Şîî	3,7%	1,0%	13,8%	3,8%
Ateîst/Agnostîk/Deîst/Hemû	17,3%	0,3%	12,8%	25,8%

Li gel vê yekê di nav ciwanên ku dengê xwe didin HDPyê de rêjeya xwedîbûna bi baweriyeka olî nêzî sê qatî yê ku bawerîya wan nîne ye. Dîsa di nav ciwanên ku nêzî HDPyê de ne rêjeya yê ku bi pergali nimêj dikin ji yê ku qet nimêj nakin zêdetir e. Nêzî nivê van ciwanan parve dikin ku bi awayekî bêpergal be jî di nav de nimêj dikin. Ji lewre jidûrbûna olê ya di nav ciwanên HDPyê de li gorî nîveka tirkîyeyê bilind û sekulerbûn leztir be jî, divê neyê ji bîr kirin ku piraniya van ciwanan xwedî bawerî ne û oldar in. Ev encam, nîşan dide ku ew mîta di derbarê ciwanên nêzî HDPyê de dibêje bê ol û sekuler in, bipirsgirêk e.

Di nav ciwanên kurd yê ku xwe wekî ateîst, agnostîk û deîst pênasê dikin, rêjeya mêran ji ya jinan zêdetir e. Li hember her çar mêran sê jin xwe bi van nasnameyan pênasê dikin. Li hêla din tê dîtin ku jinên ciwan profîleka oldartir û muhafazakartir xêz dikin û rêjeya jinên ciwan yê kurd yê sergirtî gelek di ser ya nîveka tirkîyeyê re ye.



Ciwanên kurd diyar dikin ku bi berawirdî pênc sal berê oldariya wan kêmbûye. Piraniya ciwanan dizanin û dibêjin ku ji hêla bawerî û oldariyê ve bi malbatên xwe re xalên cuda ne. Yê ku xwe wekî mîsliman pênase dikin û bi awayekî bipergal taetan bi cih nayînin, vê yekê wekî kêmasiyekê tînin zimên. Beşeka girîng ya kesên ku ji olê dûr ketine, ji ber difikirin ku dê bi malbatên xwe re pev biçin, tercîh dikin ku bi malbatên xwe re li ser vê mijarê neaxivin an jî ji wan veşêrin.

Ciwanên kurd, dîrketina ji olê an kêmbûna oldariyê di tiştên ku di rasteka şexsî û malbatî hatine jiyîn û bi hesta ku temsîliyeta kamûyî bûye sebeb jî girê didin. Ciwan serpêhatiya xwe ya dîrketina ji olê li hêlekê bi faktorên wekî xwendinên şexsî, hawîrên hevalan yê guherî, fişara malbata vê rave dikin, li hêla din temsîlkirina olê di kulvareka siyasî de an jî tesîra nêzîkiya têkiliyên saziyên olî bi siyasî re jî tînin zimên. Cemaetên îslamî û saziyên girêdayî wan, nêzîkbûna wan ya hem bo kurdan û pîrsgirêka kurdan hem jî ji ber ku dîmeneka ku nêzî îktîdarê didin, tesîrekê diafirîne ku ciwanan ji van saziyan û ji lewre ji oldariyê û olê dûr dike.

Di nav ciwanên kurd de du faktor hene ku meyla dîrketina ji olê ya têkildarî helwesta siyasî pihêt dikin. Ya pêşî, ciwanên kurd difikirin ku di pîveka tirkîyeyê de AK Parti di nav temsîleka îslamî de ye û dijberiya wan ya bo AK Partiyê vediguhêre faktoreka ku wan ji olê dûr dixê. Ya duyem, di rasteka herêmî de, atmosfera êrîşa DAIŞê û rêxistinên din yê îslamî yê çekdar yê li sûriyeyê, bi bîr tînin an jî binê wê xêz dikin ku ev rêxistin îro li cihên wekî Efrînê xerabiyê li kurdan dikin. Angaştê temsîla îslamî ya van rêxistinan dibe sedema tesîreka ku dîrketina ciwanan ji olê lezgin dike.


“ Ez ji îslamiyetê bawer dikim bes bi awayekî tam, îslamiyetê najîm. Helbet berê yekî bawermendtir bûm. Ev heye: bi awayekî giştî ji ber ku yê mezin di vê mijarê de fişarê dikin em tûşî guherîna dibin. Her ku em dixwînin, bi xwe dijîn, fikrên me çêdibin, em diguherin. Baweriyên me yê olî hene, di navbera xwişk û birayên me de jî cudahî hene bes ji ber ku dê-bavê me di vê mijarê de zahf domînant in, ji ber fişarê gelek ji wan ji îslamiyetê sar bûn.

“ Li gorî min, di mijarên dînî de gotinên malbatan yê wekî ‘nimêj bike, wêya bike, vêya bike, xwe binixumîne!’ ku tim bo jin û mêrên ciwan dibêjin, zahf şaş e. Wiha difikirim ku divê wê olê bi zanetî ji herî serî heta bi hûrgiliyan bi awayekî xweş vegêrin û nixumandin an jî vekirinê ji wan re bihêlin.

“ Baweriya min bi hebûna afirînerokê heye çiku raveyeka min ya din nîne. Ji bilî wê pêwendiyeka min bi tu olekê re nîne. Ez ji malbatekê tîm ku baweriyê bi îslamiyetê tînin, hînî Qur’ana Kerîm bûm, hindik mabû bibûma hafiz. Piştê dema derketim cîhana derveyî, dema ji malbata xwe derketim derve, dibêjim qey min tiştine red kirin. Ji hêla olî û fikrî ve di navbera min û malbata min de zahf cudahî hene. Wiha difikirim ku sedema cudahiyê bi giştî pêşveçûnî ye. Ez di pêvajoya dibistanê de bi naskirina mirovên cuda re û bi zanîn û ferqkirina, hebûna fikrên cuda re mezin bûm. Bi vî awayî fersendeka min ya lêpîrsînê çêbû bes fersendeka wiha ya dê-bavê min tune bû.

- “ *Dikarim bibêjim ku bêbawerî me. Di pênc salên dawî de girantir bû, dikarim bibêjim ku sedema guherîna min ya li gor pênc sal berê, rasthatina min ya bergehên cuda û zêdebûna min ya serhevdeya zanîne ye.*
- “ *Xwe wekî agnostîk hest dikim. Heçku di pênc salên dawî de guherî, min dest pê kir ku zêdetir wekî şêweya jiyana çandî li olan binêrim. Beriya wê fikrên min ên oldartir hebûn. Dê-bavekî min ên ku bi çanda îslamî mezin bûne hene, bes ew di malbatên xwe de ji min zêdetir marûzî doktirînên olî mane. Zêdetir li hawîrên olî mane. Ez marûz nemam, derfetên min çêbûn ku serbixwetir û azadtir bifikirim.*
- “ *Pênc sal berê bawermendtir bûm. Siyasetê, mirov bi olê xapandin, kêfa min jê re nehat, kir ku jê dûr bikevim, ez jê sar kirim.*
- “ *Ez bawer dikim ku xwedê heye bes baweriyê bi tu mislimanên li ser rûyê dinyayê nayînim. Dema hûn li 5 sal beriya wê binêrin, siyasetê nedikarî bikeve hundirê mizgeftê bes niha siyaset kete mizgeftan. Di devê oldaran de 7/24 emilandina navê xwedê di nava siyasetê de... Ji ber vê yekê guherînek pêk hat.*
- “ *...Hûn endamê cemaetekê an jî civakeka sîvîl in, wê demê ji hêla madî û manevî hûn baş didebirin bes ji ber pirsgerêkan ku paşê derdikevin, hûn û kesên ku endamên wira ne, pirsgerêkan dijîn. Mînaka herî mezin ya vê yekê rêxistina terorê FETÖ ye..*

GRAFÎK 12: ASTA DÎNDARIYÊ YA CIWANÊN KURD





5.4. Zimanê Zikmakî

Her çiqas nivê ciwanan dibêjin em zimanê dayikê dizanin jî, di jiyana rojane de zimên zêde naemilînin. Herî kêr ji pênc kesan yek yê ciwanên kurd êdî zêde bi kurdî nizanin û hema bêje qet naemilînin. Beşeka yên ku bi kurdî nizanin her çiqas bibêjin ku ji hêla dê-bavî ve qet nehatiye fêrkirin, beşeka girîng jî dibêjin ku bi demê re emilandina kurdî kêr bûye û kurdî hatiye jibîrkirin. Beşeka girîng yên ku dibêjin em di asta navîn an jî baş de ziman dizanin jî bi piranî bi tirkî diaxivin. Yên dizanin, herî zêde bi dê-bavên xwe re bi kurdî diaxivin. Rêjeya yên ku bi piranî an jî bi giştî bi dê-bavên xwe re bi kurdî diaxivin, li dor ji sêyan yek e. Zimanê têkiliya bi xwişk-bira, heval û hevser/xoşewîsta re bi piranî tirkî ye.

TABLO 19: HÎREBÛNÊN EMILANDINA KURDÎ YA CIWANÊN KURD

	BI DÊ RE	BI BAV RE	BI HEVSER/ XOŞEWÎST RE	BI XWIŞK/ BIRAYAN RE	BI HEVALAN RE
Tenê tirkî	17,9%	18,6%	49,7%	32,4%	36,1%
Bi piranî tirkî, carna zimanê zikmakî	25,9%	25,4%	21,7%	26,7%	31,7%
Tirkî û zimanê zikmakî wek hev	14,4%	14,0%	11,7%	15,1%	19,3%
Bi piranî zimanê zikmakî, carna tirkî	21,3%	21,2%	12,4%	17,5%	11,4%
Tenê zimanê zikmakî	20,5%	20,8%	4,4%	8,3%	1,5%

Bi berawird nifşên berê li gel ku astengiyên li pêş ziman û nasnameya kurdî bi awayekî diyar bûye jî bi awayekî lezgîn kêmbûna emilandina zimên û bi taybetî ketina zazakî ya nav zimanên ku li ber wendabûnê ne, di beşeka girîng ya kurdan de dibe sedema tirsê bi vê asîmîlasyonê çandî re dê daxwazên polîtîk jî kêr bibin. Li hêla din bi tevahî tê qebûlkirin ku armanca nihaî ya polîtîkayên berdewam yên asîmîlasyonê tê hêvîkirin jî ev e. Lê belê li hêlekê kêmbûna emilandina zimên wekî tesîra asîmîlasyonê dewam bike jî li hêla din dîteyên lêkolînê nîşan dide ku şîroveyên wekî ev rewş dê bi devjêberdana daxwazên polîtîk yên nasnameyî û yên girêdayî wê bi encam bibe, şaş in.

Nifşê îro yê ciwanên kurd, berovajî hêviyên burokrasiya netewperest ya dewletê û tirsê raya giştî ya kurdan, bi berawird nifşên berê daxwazên wekî perwerdehiya bi zimanê zikmakî, qebûlkirina zimanê kurdî wekî zimanê fermî, bi awayekî vekirîtir tînin zimên û daxwaz dikin. Nêzî temamê ciwanan wiha difikirin ku divê kurdî li dibistanan bi tena serê xwe an jî bi tirkî re bibe zimanê perwerdehiyê.

TABLO 20: NIHÊRÎNÊN CIWANÊN KURD YÊN LI SER PERWERDEHIYA BI ZIMANÊ DAYIKÊ

Li gor we bo yên ku zimanê wan yê zikmakî ne tirkî ye li dibistanan	YEKÛN	AK PARTÎ	HDP
Divê bi tenê zimanê zikmakî zimanê perwerdehiyê be	10,2%	7,2%	14,0%
Divê her du jî zimanê perwerdehiyê bin, hem tirkî hem zimanê zikmakî	64,7%	49,3%	76,1%
Divê zimanê perwerdehiyê bi tirkî be, zimanê zikmakî jî divê li dibistanê were hînkirin	19,8%	31,6%	8,6%
Divê zimanê perwerdehiyê bi tirkî be, hewce nake ku zimanê zikmakî jî li dibistanê were hînkirin	5,4%	11,8%	1,4%

Li gor we bo yên ku zimanê wan yê zikmakî ne tirkî ye li dibistanan	YEKÛN	HERÊM	ROJAVA	JIN	MÊR
Divê bi tenê zimanê zikmakî zimanê perwerdehiyê be	10,2%	9,7%	11,0%	11,3%	9,2%
Divê her du jî zimanê perwerdehiyê bin, hem tirkî hem zimanê zikmakî	64,7%	65,8%	63,0%	62,8%	66,4%
Divê zimanê perwerdehiyê bi tirkî be, zimanê zikmakî jî divê li dibistanê were hînkirin	19,8%	18,7%	21,4%	19,6%	19,9%
Divê zimanê perwerdehiyê bi tirkî be, hewce nake ku zimanê zikmakî jî li dibistanê were hînkirin	5,4%	5,8%	4,7%	6,3%	4,5%

Pirsgirêkên kurdan	TOTAL	DIYARBEKIR, WAN, MÊRDÎN	STENBOL, ÎZMÎR
Zimanê zikmakî	38,4%	36,7%	51,7%

Ciwanên ku koçî rojavayê kirin ji ber tesîra cudakariya dijîn û qerekerê netewperwer yê hawîra siyasî ya ku muxatabê wê dibin, hem ji bo refleksa li dijî cudakariyê hem jî ji bo têkneçûna li hember netewperestiya raser, wekî paratonerekê li pêdiviya zimanê zikmakî dipênihin.

Lê gel vê yekê, tevî van meylan, di mijara nihêrîna erênî ya perwerdehiya bi zimanê zikmakî de hîlbijêrên kurd yên li parêzgehên rojava dijîn bi awayekê germtir lê binihêrin jî di navbera parêzgehên kurdan û yên rojavayê de ferqeka watedar nîne. Bi awayekî şibî wê, di navbera jin û mêran de jî ferqeka watedar ya tercîhê nayê raçavkirin.

5.5. Tercîhên Siyasî û Hêviyên ji Siyasetê

Ciwanên kurd jî wekî ciwanên din, saziya siyasetê wekî çavkaniya pirsgirêkên jiyana rojane dibînin. Ji ber vê sedemê eleqedarî siyasetê ne bes ne nêzîkî wê ne. Siyaset ciwanan cezb nake. Xîtabî wan nake. Wiha difikirin ku siyaset di nav çerxeka bêşûd de ye.

Faktoraku ciwanên kurd ji yên din vediqetîne, pirsgirêkên binyadîtir yên siyasetê ne. Ciwanên kurd diyar dikin ku di serdemên ku pirsgirêka kurd di peywenda çareseriyê de bibû rojev, rewşa hewayê giştî ya siyasî baş li wan

hatiye, xwe aramtir û eleqedarê siyasetê hestkirine jî, wiha difikirin ku siyaseta giştî ya tirkîyeyê ku pirsgirêkê ne di çareseriyê de lê di peywenda pevçûn û ewlehiyê de dinirxînin, li dijî kurdan cudakariyê dihewîne.



Bi taybetî ciwanên kurd yê nêzî HDPyê difikirin ku wan kariye di qada çandî de bo xwe kulvarê vekin û xwe heyî bikin û xwe pêk bînin, lê tişta ku di qada siyasî de dixuyê “hincirandina kurdan û eziyetkişandina wan” e. Di vê peywendê de mirov dikare bibêje ku yek ji wan sebebên ciwanên kurd eleqeyê nîşanî qada çandî didin, reva ji qada siyasî ya tê de “eziyetê dibînin” berev qada çandî ye.

Ji bo ciwanên kurd pirsgirêk bi şiklê pirsgirêkên tirkîyeyê û yê kurdan bo du serenavan vediqete. Di van her du serenavan de pirsgirêkên şibîhev hebin jî, zimanê zikmakî û cudakarî wekî du qadên pirsgirêk yê ku ciwanên kurd duherî dikin, derdikevin holê.

Di nezera ciwanên kurd de, tirkîye hema bêje di her mijarê de di rewşa xerab de ye. Ciwanên kurd yê ku serenavên herî zêde di halê xerab de ne wekî pirsgirêkên jinan, aborî û edaletê rêzê dikin, dema rewşa tirkîyeyê dinirxînin çî ji her kesê tevahiya tirkîyeyê çî jî ciwanên din bergeheka reşbîntir dibînin.

TABLO 21: NIRXANDINA CIWANAN YA LI SER TIRKIYÊYÊ

Tirkîye li qadên li jêr hatine jimartin çiqas baş e? (1/10)	CIWANÊN KURD	CIWANÊN TEVAHIYA TIRKIYÊYÊ	TEVAHIYA TIRKIYÊYÊ-HER KES
Çareseriyên bo pirsgirêkên jinan	1.94	2.6	3.16
Aborî	2.06	2.53	3.09
Edalet	2.21	2.85	3.46
Azadiya derbirrînê	2.31	3.02	3.66
Pergala perwerdehiyê	2.34	3.01	3.51
Medya	2.38	3.13	3.64
Têkiliyên derve	2.57	3.25	3.8
Bajarîbûn	2.84	3.72	4.07
Çareseriyên bo pirsgirêkên derdorê	2.85	3.22	3.73
Çandinî	2.93	3.31	3.62
Çand û huner	3.15	3.76	4.23
Pergala tendurustiyê	3.51	4.07	4.43

	Yekûn	AK PARTÎ	CHP	HDP
Krîza aborî heye	77,5%	55,6%	87,2%	87,5%
Tirkîye dê neşê bibe endama YEyê	77,5%	55,9%	78,7%	90,4%
Polîtîkaya wê ya suriyeyê rast nabînim	73,2%	44,1%	78,7%	90,4%

Ciwanên kurd li gel hebûna pirsgirêkên wekî pirsgirêkên jinan, bêdaletî, xerabiya pergala perwerdehiyê û boçûna xerab ya aboriyê, şerê siyasetmedaran bi hev re, xelet dibînin. Li gorî wan divê siyasetmedar îdeolojiyan deynin hêlekê û li rêyên çareseriyên tevbigerin. Ciwan hêviya edalet, wekhevî, durustî û rapêçîneriyê ji siyasetê dikin.

Hêviyên ciwanên kurd ji siyasetê; li gel sernavên giştî û şexsî yên wekî qedandina gendelî û îltimaskariyê, daxilkirina ciwanan bo mekanîzmayên biryarê, destpêkirina projeyên pêşveçûnê yên nîskok teknoloji ku ciwan tê de werin îstihdamkirin, daxwazên kolektîf yên wekî statudana kamûyî bo kurdî, hêzdarkirina rêvebiriyên herêmî jî dihewîne.

Pirsgirêk û xemên pêşdatir yên kurdên ku dengê xwe didin HDPyê û bi taybetî yên ciwanên kurd ji ber ku ji ser pirsgirêka kurd şikil digire û li gel ku polîtîkayên AK Partiyê bi polîtîkaya xwe ya kurdan ku di demên dawî de vegeriya halê berê jî bi awayekî berdewam ji kurdan dangan distîne, ev dibe sedem ku şaşiyek wiha derkeve ku kurdên ku dengên xwe didin partiyên din, bi taybetî yên didin AK Partiyê girîngiyê bi meseleya kurdan û pirsgirêkên kurdan nadin. Encamên lêkolînê, nîşan didin ku ji xeynî ciwanên ku dengê xwe didin HDPyê, ciwanên din jî bi rêjeyeka girîng girîngiyê bi pirsgirêkên kurdan didin.

TABLO 22: FIKRÊN CIWANÊN KURD DI DERBARÊ PIRSGIRÊKÊN KURDAN DE

		YEKÛN	AK PARTÎ	CHP	HDP
Kurd bi berawird 5 sal berê li tirkîyeyê...	Di rewşeka baştir de	22,4%	46,7%	24,5%	11,6%
	Neguherî	47,8%	42,8%	53,2%	44,9%
	Di rewşeka xerabtir de	29,8%	10,5%	22,3%	43,5%
Kurd 5 sal şûn de li tirkîyeyê...	Dê di rewşeka baştir de bin	28,9%	51,0%	30,9%	20,7%
	Dê neguhere, dê wekî xwe bimînin	48,5%	39,8%	53,2%	46,4%
	Dê di rewşeka xerabtir de bin	22,6%	9,2%	16,0%	32,9%

Pirsgirêkên kurdan	TOTAL	DIYARBEKIR, WAN, MÊRDÎN	STENBOL, ÎZMÎR	EDENE, MÊRSÎN	RIHA
Zimanê zikmakî	38,4%	36,7%	51,7%	28,2%	25,2%
Cudakarî	24,0%	25,6%	18,5%	25,8%	28,6%
Perwerdehî	12,5%	10,6%	12,1%	14,5%	17,6%
Bêkarî	9,8%	8,7%	4,7%	16,9%	17,6%
Azadiya fikrî	7,4%	9,3%	5,3%	7,3%	5,7%
Bêdaletî	5,5%	6,4%	4,0%	6,5%	5,2%
Pirsgirêka nasnameyê	2,4%	2,8%	3,7%	0,8%	0,0%



Pirsgirêkên kurdan	JIN	MÊR	AK PARTÎ	CHP	HDP
Zimanê zikmakî	36,1%	40,5%	29,3%	30,2%	46,4%
Cudakarî	27,9%	20,5%	23,7%	25,6%	21,4%
Perwerdehî	11,7%	13,3%	20,5%	15,1%	8,4%
Bêkarî	8,5%	10,9%	14,5%	8,1%	7,8%
Azadiya fikrî	10,2%	4,8%	6,0%	15,1%	6,2%
Bêdaletî	3,6%	7,2%	5,2%	4,7%	7,3%
Pirsgirêka nasnameyê	2,0%	2,8%	0,8%	1,2%	2,6%

Ciwan, bi taybetî li rojavayê bi awayekî bingehîn rû bi rûyî pirsgirêka cudakariyê dibin û zimanê ku bo kurdbûnê hêmana herî diyarker e çî bi tesîra cudakariyê çî jî bi neemilandina wê ya di qada giştî re, bi demê re ji bîr dikin. Ji ber vê sedemê, li gor ciwanên kurd yê ku dengê xwe didin hem AK Partiyê hem jî didin CHPyê jî pirsgirêkên herî mezin yê kurdan pirsgirêka zimanê zikmakî û cudakariyê ye. Ev ciwan jî bi rêjeyeka nehindik piştgiriya perwerdehiya zimanê zikmakî dikin.

Heta tê dîtin ku hilibijêrên ciwan yê nêzî Hûda-Parê bi rêjeyeka nêzî ciwanên HDPyê li daxwazên wekî perwerdehiya zimanê zikmakî û qebûlkirina zimanê kurdî wekî zimanê fermî, xwedî derdikevin. Lê belê yek ji wan faktorên ku pozîsyona polîtîk ya ciwanên HDPyê diyar dike kurdî û daxwazên têkildarî wê ne, bi taybetî ciwanên CHPyê û AKPyê pirsgirêka zimanê zikmakî wekî pirsgirêkekê dibînin û piştgiriya wê dikin bes pozîsyona wan ya polîtîk di ser mijara kurdî şikil nagire.

5.6. Tercîhên Partiya Siyasî

Têkiliyên ciwanên kurd yê bi AK Partî û CHPyê re, xwe naspêre vegêranên dîrokî û qaliban lê xwe dispêre azmûnên xwe. Heta demeka nêzîk qenaetek wiha hebû ku îmajeka xerab ya mayinde ya CHPyê li nav kurdan heye û ev zaniyariyek bû ku li ser wê hevgerînek hebû bes ciwanên îro vê qenaetê dixelîtînin. Bo ciwanên HDPyê: tifaqa AK Partiyê ya bi MHPyê re û ji rojevê rakirina hewlên çareserkirina siyasî ya pirsgirêkên kurdan hat wê maneyê ku ew vegeriya ser çareserkirina pirsgirêkê bi rêbazên leşkerî û bû sedem ku bo AK Partiyê mesafeyek di navbera ciwanên kurd derkeve ku ev mesafe hê jî vedibe.

Li hêla din di hilibjartinên 31ê adarê de li rojavayê tirkiyeyê piştgirîkirina CHPyê ji hêla HDPyê ve û zimanê namzetên CHPyê yê pûte pê didan ku kurdan neêşînin, bi serkeftina muxalefetê re bû yek û wiha dixuyê ku li tirkiyeyê bo guherînekê derî firk kiriye. Îmaja neyînî kevneşopîya li nav kurdan ya CHPya ku bûye aktorê girîng yê vê guherîne, bo ciwanan ji ber ku xwe naspêre tecrubeyan lê xwe dispêre vegêranê, lewre ew krediyeka girîng ya îtibarê ne ji bo CHPya di vegêrana dîrokî de bîzat bo CHPya ku ew tecrube kirine, vedikin. Bilindbûna CHPyê ji van faktorên xwedî dibe û tê pozîsyona partiya duyem ya ciwanên kurd. Wiha dixuyê ku Ekrem Îmamoğlu wekî encameka vê pêvajoyê

di nav ciwanên kurd de populariteyeka girîng bi dest xistiye. Nîvê ciwanên HDPyê, CHPyê wekî partiya xwe ya duyem dibînin. Pêkan e ku mirov vê rewşê li gor encamên li jor hatiye behskirin bi awayekî vekirî yan jî nixumî wekî nîşaneyekê bixwîne ku têkiliyên tifaqê bûye sedem ku alîgirên partiyan nêzîkî hev bibin. Çiku nêzîkbûna ciwanên HDPyê bo CHPyê bi qasî wê nebe jî di nêzîkbûna ciwanên AK Partiyê bo MHPyê de dixuyê. AK Partiyê jî kariye ku beşeka girîng ya hilibijêrên xwe yê ciwanên kurd nêzîkî MHPyê bike. Di nav ciwanên kurd de yê ku dengê xwe dane AK Partiyê rêjeya yê ku partiya wan ya duyem MHP ye ji %33,3 ye.

TABLO 23: TERCÎHÊN PARTIYÊN SIYASÎ YÊN CIWANÊN KURD

		HILBIJARTINÊN GIŞTÎ YÊN 2018AN			
		Yekûn	AK PARTÎ	CHP	HDP
Heke vê yekşemê hilbijartin çêbibe	AK Partî	18,3%	79,9%	0,0%	0,6%
	CHP	7,5%	2,0%	64,9%	2,6%
	HDP	45,3%	3,7%	11,7%	87,3%
	Yên din	19,6 %	10,4%	17,0%	7,8%
	Dê deng neemilînim	9,3%	4,0%	6,4%	1,7%

		Partiya siyasî ya ku hûn herî zêde xwe nêzî wê dibînin kîjan e?		
		AK PARTÎ	CHP	HDP
Partiya duyem ya herî nêz	AK Parti	0.0%	8.7%	6.2%
	CHP	12.3%	0.0%	50.0%
	MHP	33.3%	1.6%	0.9%
	İYİP	1.5%	11.0%	0.7%
	HDP	26.5%	49.6%	0.0%
	Yok	13.3%	18.9%	28.4%

Partiya herî nêz	AK Parti	22,0%
	CHP	8,6%
	HDP	51,6%
	Nîne/Yên din	17,8%
Partiya duyem ya herî nêz	AK Parti	5,3%
	CHP	29,5%
	MHP	8,2%
	HDP	12,2%
	Nîne/Yên din	44,8%
Partiya herî dûr	AK Parti	31,0%
	CHP	10,1%
	MHP	31,2%
	İYİP	2,6%
	HDP	6,7%
	SP	4,8%
	Nîne/Yên din	13,6%



Li gel vê yekê nêzîkbûna ciwanên HDPyê berev CHPyê û nêzîkbûna ciwanên AK Partiyê berev MHPyê, ji tesîra erênî ya tifaqan der dibe. Bes ev nêzîkbûn ji bo CHPyê û bi taybetî ji bo MHPyê zêdetir serdemî dixuyê. Bo ku mirov bibêje vê nêzîkbûna siyasî guherîneka civakî afirandiye, hêj zû dixuyê. Çiku ciwanên kurd yên ku nêzî MHPyê bûne, vê yekê bi xatirê AKPyê, ji ber ku AK Partiyê, MHP daxilî tifaqa komarê kiriye, girê didin û zêdetir ji ser pêwîstiyên qenaetan diyar dikin. Li hêla din ciwanên nêzî HDPyê li gel ku krediya erênî bo CHPya ku “hewl dide xwe pêşve bibe”, nasnameya wê ya “demokrat” vekirine jî, îmajê wê ya dîrokî bi bîr tînin.

“ (CHP) ... di demên berê de têra xwe berbad bû. Lê niha, wiha dikirim ku bo xwepêşxistinê vekirî ye.

“ di rabirdûya xwe de li xaleka Kemalîst, wekî partiya Atatürk derbas dibe. [Îro] Ji hêlekê hewl dide bi İYİ Partiyê re, bi HDPyê re tifaqê bimeşîne, faktora Saadetê qismen be jî heye. Di pêvajoya van 5-6 salên dawî de binyateka wê ya meyldar heye ku ji diyalogê re zêdetir vekirî ye, hewl dide cudahiyan bigire nava xwe, wan bihewîne, organîze bike.”

Ciwanên kurd yên ku bi CHPyê re nêzîk bûn, li gel ku rabirdûya wê di hişê xwe de digirin, girîngiyê bi guherîna CHPyê didin ku bi hîlbijartinên giştî yên 2018an dest pê kiribû û di hîlbijartinê herêmî ya 2019an de ji sivdereka girîng borî. Di hîlbijartinên herêmî de arezûkirina têkçûna AK Partiyê ji hêla HDPyê ve di serî de Ekrem İmamoğlu eleqe û piştgirîkirina namzetên CHPyê bi xwe re anî. Ciwanên kurd ji ber hal û helwesta ku çî CHP û HDPyê çî jî alîgirên van partiyan nêzî hev kirine, wiha difikirin ku CHP ji pozîsyona xwe ya piştgiriya rakirina destnedayîniyê, piştgirîkirina tezkereyên piştînorî, hêdî be jî berev guherîne werar dibe. Tê dîtin ku di hîlbijartinên 2023an de an jî yeka ku berî wê çê bibe heke namzetê CHPyê yekî di profîla Ekrem İmamoğlu de be ciwan dê bi rehetî piştgiriya wî bikin. Li hêla din Mansur Yavaşê ku li enqereyê bi logoya CHPyê qezenc kir, wiha dixuyê ku bi performansa ku bi şaredariyên din yên bajarên mezin yên CHPyê re nîşan da, bala ciwanên kurd kişandiye. Ciwanên dizanin ku

Yavaş netewperestekî (ülkücü)/ MHPyîyekî kevn e jî li gel ku xalekê datînin rehê wî yê netewperest, tespît dikin ku di nava nasnameya CHPyê de bi awayekî nîsbî performansa rêvebirineka sosyal demokrat nîşan daye.

Ciwanên kurd di çarçoveya van hemû tiştên ku hatin vegêran de, li gel ku hay ji teyisîna neyînî di kurdan de ya bîra dîrokî ya CHPyê, wiha difikirin ku divê ev guherîna CHPyê bidome. Li şûna pirsgirêka kurd bi tenê li ser piştê HDPyê bimîne, ciwan li bendê ne ku aktorên wekî CHPyê vî barî parve bikin. Li gel hebûna ciwanên diyar dikin ku bi CHPya ku bi îdeolojiya kemalîst re bi derxistina pirsgirêka dîrokî re dê neyê lihevkin, piraniya ciwanan nîşaneyên hêzdar nîşan didin ku heke CHP vî barî parve bike dê mesafeya wan ya di navbera CHPyê de jî kêmtir bibe û bi CHPyê re peywendiya wan xurt bibe ku ev yek dê ne ji ber dîroka partiye bes ji ber azmûnan be.

“ Ji ber ku CHP di demên dawî de [têkildarî kurdan] gavan diavêje û ji ber ku nêzîkbûnên wan ya bo mirovan erênî ye, piştgiriya wê dikim. Heke wiha dewam bike belkî ez berdewamî piştgirîdana wê bibim.

Di dîroka ku lêkolîna jimarî dihat kirin de ji ber ku Deva û Gelecek Parti hêj ava nebibûn, eleqeya bo van partiyan nehatibû pîvandîn. Lê belê ji wê dîrokê û ta îro ji hevdîtîninê wesfî yê ku hatin kirin an jî ji civînên koma focusî wiha dixuyê ku Deva û Gelecek Partiyê bi qismî be jî karîne bala ciwanan bikişînin. Ciwanên ji van partiyan haydar in û berê nêzî AK Partiyê bûn, wekî îhtîmaleka ku dê nerehetiya wan ya bo AK Partiyê têr bike, Deva û Gelecek Partiyê dişopînin.

5.7. Helwestên Li Hember Serokên Siyasî

Di nav ciwanên kurd de li hember aktorên siyasî yê kevn yan jî yê kevn bûne, guhnedariyeka tevahî heye. Yê ku ciwan îro xwe nêzî wan dibînin jî di nav de, ev aktor, ciwanan kelecana nakin. Mansur Yavaşê ku dikare wek siyasîmedarê kevn were dîtin, her ku vediyarbûna şaredariyên CHPyê zêde dibin û şiyana xwe ya rêvebirinê ya li Enqereyê tîne bo qada giştî ji beşeka diyar ya ciwanên kurd teqdîrê distîne.

Ciwanên kurd yê ku nêzî AK Partiyê û Erdoğan in ji kelecana ku ji siyasî û perfonmasa îro digirin, zêdetir, pêwendiyê bi îcraatên berê û ji ser têkiliya wefayê û qada ewle ya polîtîk ku bûna “li wê derê” ew dabîn dikir, datînin.

Li hêla din hem di ciwanên kurd yê nêzî CHPyê de hem jî di nav yê nêzî AK Partiyê de HDP wekî xaleka girîng ya eleqeyê tê nirxandin. Her ji çar ciwanên nêzî AK Partiyê yekî wan HDPyê wekî partiya xwe ya duyem dibînin. Ciwanên kurd yê nêzî CHPyê, HDPê wekî partiya xwe ya duyem dibînin. Bes di ciwanên HDP û CHPyê de eleqeyeka şibî AK Partiyê nayê dîtin.

Her ji pênc ciwanên kurd yekê ku di 2018an de dengê xwe daye AK Partiyê dibêjin ku dê dengê xwe nedin AK Partiyê. Ev nerehetî bi dûrketina ji nasnameya reformîst ya AK Partiyê tê ravekirin.

“*bi rastî jî AK Partiyê gelek nûbûn anîn. Heke niha serê me girtîbe ev bi saya Erdoğan e, kurd im û heke diaxivim bi saya wî ye. Birrek nûbûn anîn. Teqez bo partiyên din girtî bûm, bi tenê AK Partî hebû bo min. Niha ew jî tune. Wekî serokê partiyê min serokkomarê me bo mînak digirt bes di demên dawî de min dev ji wî jî berda, ne wekî berê me, min dev ji wê fikra xwe jî berda.*”

Bo ciwanên kurd serokên ku tîne ecibandin, li gor pozîsyonên kesên şikil bigire jî İmamoğlu û Demirtaş, du kes in ji hêla kesên ku ne mensubê partiya wan jî tîne ecibandin. Demirtaşê ku piştî demek dirêj di siyaseta kurdî de wekî aktorekî girîng derket pêş, serokek siyasî ye ku bi ferqeka mezin tîne ecibandin. Demirtaşê ku nêzî temamê ciwanên kurd yê nêzî HDPê navê wî tînin, ji hêla ciwanên kurd yê ku dengê xwe didin partiyên din jî, ji nav siyasîmedarên mensubê partiyeka din ya siyasî, dengê herî zêde distîne.



“ Wekî siyasî ez, Selahattin Demirtaş dicibînim. Rast dibêje, rast diaxive, ruhê siyasîmedarîyê di nava wî de heye, her çiqas alîgirê partiyeka cuda bim jî li hêla rastiyê me

“ Selahattin Demirtaş kesek e ku bi taybetî ne bi tenê derdora xwe ya siyasî lê xîtabî hemû derdorên siyasî dike, qerekerê siyasî ye ku gelekî pêdivî pê heye

Wekî bersiva pirsê vekirî ya, hûn dixwazin kî bibe serokomar, ciwan wek bersiv navên Demirtaş, Erdoğan û Îmamoğlu didin. Ya balkêş, ciwanên kurd bi rêjeya ji %16an berê pêşî navê Îmamoğlu didin. Derketina qada siyasîyê û bilindbûna lezgîn ya Îmamoğlu, serdema ku populerîteya Demirtaş bilind dibû bi bîra ciwanên kurd dixê. Îmamoğlu bala hîlbijêrên ku ji nêz ve ne eleqedarê siyasîyê ne û ji nîqaşên germ yê siyasîyê dûr in jî kişandiyê ku ev yek dîsa profîla serdema serokomariyê ya Demirtaş bi bîr dixê. Ji ber ku Îmamoğlu jî wekî Demirtaş siyasîmedarê nîşî ciwan e, peyamên erênî yê her du aktorên di derbarê hev de, dîmenên wan yê sportîf û dînamîk “germahiya wan ya mirovî” hindek ji wan faktorên e ku li nav ciwanên kurd hevterîbiyek di navbera Îmamoğlu û Demirtaş de saz bibe. Nêzîkbûna ku li kêleka taybetmendiyên şexsî yê serokan, jiyana wan ya malbatî jî tîne qada giştî, bi taybet li medyaya civakî eleqeyê dibîne.


Hevdîtina Dilek Îmamoğlu û Başak Demirtaşê ku hûrgiliyên jiyana rojane vediyar dike û li aliyê din ev têkiliya di navbera hevseran de, di nav ciwanên kurd de qenaeta têkildarî hevterîbiya Demirtaş-Îmamoğlu hêzdar dike. Tê fêmkirin ku Îmamoğlu bi meşandina polîtîkayeka peywendiyê ya ku amrazên medyaya nû jî di hundirîne û zêdetir xîtabî hesta hêviyê dike û bi kampanyaya wî ya ku ciwanan dike armanc re tesîr li ciwanên kurd yê ku li metropolan dijîn û ji kevneşopiyê dûr dikevin, bi taybetî jî bala yê ku medyaya civakî bi awayekî çalak diemilînin, kişandiyê. Li hêla din ciwanên kurd, valahiya ku ji ber girtîbûna Demirtaş ya ku bûye sedema qutbûna temasê li gel ciwanên kurd, bi Îmamoğlu re dadigirin. Îmamoğluyê ku piştî Selahattin Demirtaş bi rêjeyeka girîng piştigiriyê distîne, di hev kêşeyeka ku Demirtaş tê de nîne, piştigiriyeka duqatî jî ya Erdoğan zêdetir, digire.

“ Îmamoğlu kesek e ku piştî ketina girtîgehê ya Selahattin Demirtaş ya li pey populerbûna wî ya li nav kurdan, derketiye. Ji ber vê yekê bi min [em] kurd, hewl didin ku valahiya Selahattin Demirtaş bi Îmamoğlu re dagirin. (Diyarbakir, jin)

Ciwanên CHPyî bi piştigirîkirina Demirtaş re, yê HDPyî bi piştigirîkirina Îmamoğlu re rîska terkkirina pozîsyona xwe nabînin bes ciwanên kurd yê AKPyî venaşêrin ku eleqeya wan ya bo Demirtaş dijber e bi pozîsyona wan re. Ecibandina Îmamoğlu an jî Demirtaş ji ber ku yek nakeve şûna yê din nabe pirsgirêk bes berawirdiya Erdoğan-Demirtaş, zehmetiyê dide ciwanên AKPyî yê ku vê berawirdiyê dikin. Ev ciwan neçar dimînin ku eleqeya xwe ya bo Demirtaş binixumînin an jî piştguh bikin. Ji lewre îhtimal e ku Demirtaş di serdema piştî Erdoğan de bo ciwanên kurd yê AKPyî jî bibe figurekî girîng yê siyasî û pûte pê were dan.

TABLO 24: TERCÎHÊN SEROKAN YÊN CIWANÊN KURD

Kî bila bibe SK (serokkomar)?



	YEKÛN	AK PARTİ	CHP	HDP
Abdullah Gül	7.1%	8.2%	8.5%	6.3%
Ekrem İmamoğlu	38.4%	5.3%	81.9%	53.5%
Recep Tayyip Erdoğan	18.2%	76.0%	0.0%	0.5%
Bêbiryar im	11.0%	5.9%	4.3%	9.0%
Dê deng neemilînim	25.3%	4.6%	5.3%	30.8%

Ciwanên kurd di wê qenaetê de ne ku hêvî û/an jî kelecana ji hêla aktorên siyasî yên nû û ciwan tê hilberandin. Di vê peywendê de ji bilî Demirtaş, amaje bi navê bi taybetî İmamoğlu û bi qismen Babacan dikin. Tê dîtin ku Babacanê ku di mijdara 2019an de hêj partî ava nekiribû nasyariya wî kêmbû, her ku vediyariya wî zêde dibe, eleqeyeka ciwanan bo wî çêdibe. Tê dîtin ku di nav ciwanên kurd de ji bilî Demirtaş, li gel İmamoğlu, populerîteya Babacan jî bilind dibe. Li gel vê yekê tê kirpandin ku aktorên ku hêvî ji wan tê kirin di warê bawerîdanê da hêj kêmbûn.



Ciwanên kurd, rabirdûya AKPyîbûna Babacan bi bîr dixin û difikirin ku divê ew “xwe bipeyitîne” û dixwazin têkildarî berdewamkirin an neberdewamkirina helwesta erênî ya siyasetmedarên CHPyî yên ku bi piştgiyariya kurdan hatibûn hilbijartin, gavên ku baweriyê didin, bibînin.

“*Erdoğan serokekî zahf baş e, bo ku li pêşber wî bisekinin bi rastî divê bi tiştên beraqil werin û em dê bibînin ka di vê mijarê de dê çiqasî kêrhatî bin, çi qasî wêrek bin.*”

“*Xwe zêdetir nêzî Babacan hest dikim. Çiku Babacan ciwantir, radîkaltir difikire.*”

“*CHP [îro] partiyeka azadîxwaz e. HDP tunebe em dê dengê xwe bidin CHPyê bes bi saya dengên kurdan tên derinan, qiyetê vê yekê nizanin. ... Dema ku HDP ji bo rewşekê tê sûcdarkirin, piştgiyariya wê nayê kirin. ... Divê CHP kurdan jî biparêze.*”

5.8. Radîkalbûn û Tundûtûjî

Hindek peyvên ku aktorên siyasî yên kurdan di salên borî de serf kirin, wekî îfadeyên jenerîk di jiyana me de cih girtin. Îfadeyên wekî “em nifşê dawî ne ku dikarin bi li hev werin”, “zarokên bager tên” gelekî hatin nîqaşkirin û di serî de derdorên çep-lîberal, ji hêla raya giştî ve hat pejirandin. Pêkan e were gotin ku ev nêzîkbûn û awayê îfadeyê bo îro mît e. Dikare were gotin ku îro ciwanên kurd di meyla wê yekê de ne ku ji hîrebûnên pêlên kevn yên siyasî dûr bikevin û bo lihevhatinê helwesteka vekirîtir pêşve bibin û mesafeya di navbera wan û radîkalbûnê jî mezin dibe.

Heta sala 2015-2016an bi taybetî bi tesîra hêzdarbûna YPGyê bi Rojavayê re meyla radîkalbûnê ya ku bilind dibû, hem veguherîna aborî û civakî ya ciwanên kurd ya di nav deh salên borî de hem jî piştî rûxana ku piştî pêla tundûtûjîyê ya ku di 2015an de û di piştî wê de derket, bi awayekî mezin di meyla kêmbûnê de dixuyê. Di vê navberê de populerîteya Demirtaş ya bilind dibe û firehbûna qada siyaseta sîvîl ya ku ji ser Demirtaş fireh dibe, yek ji wan faktoran e ku vê meylê xwedî dike. Fambariya serokê karîzmatîk ya ji berê de di nav ciwanên kurd yên polîtîk de hebû, ji fîgurên çekdar wêdetir, niha ji ber ku li ser aktorên siyasî yên kurd yên legal disekine jî wateyek e ku îro vê mîtê dixelîtîne. Li hêla din kêmbûna radîkalbûnê ji xeynî sedemên wekî dîtina

nifşên ciwan ya pêvajoyên wekî pêvajoya çareseriyê û serkeftina HDPyê ya derbasbûna ji bendavê, dikare bi van yekan were girêdan; îro li tirkîyeyê qada têkoşîna çekdarî teng bûye û bi berawird salên berê vediyariya çalakîyên PKKyê kêmbûye.

Divê were gotin ku radîkalbûna di vira de zêdetir wekî awayên têkoşînê yên çekdar/ne legal tê fêmkirin û di çarçoveya gelo tundûtûjî dikare wekî amrazekê were emilandin an na de tê nirxandin. Lew wekî ku tê gotin, di daxwazên polîtîk de ketin zêde nayê dîtin. Tê dîtin ku di navbera bilindbûn û vediyarbûna daxwazên polîtîk û tundûtûjîyê de peywendiyeka rasterast nayê sazîkirin.

Bo radîkalbûna kurdî/çepê meyla derbasdar ya kêmbûnê dikare bo ciwanên kurd yên ku li hêla îslamî ne jî were gotin. Radîkalbûna ku bi tesîra şerê sûriyeyê di 2011-15an de bilind bû, eleqe û beşdarbûna bo rêxistinên selefî zêde kiribû. Bi encambûna têkçûnê ya serpêhatiya van rêxistinên jî, radîkalbûna di ciwanên ku nêzî vê hêlê ne daye vewestandî û wiha dixuyê ku berê wê daye kêmbûnê. Dîsa ciwanên ku sempatiya wan bo kevneşopa Hizbullahê heye jî li gor nifşên pêşiya xwe, mesafeya xwe ya di navbera çekan de mezin kirine û xwe ji Hizbullahê zêdetir bi Hüda-Parê pênase dikin.

TABLO 25: FIKRÊN CIWANÊN KURD YÊN LI SER PÊVAJOYA ÇARESERIYÊ

	YEKÛN	PARÊZGEH (2LIBÎ)		ZAYEND	
		HERÊM	ROJAVA	JIN	MÊR
Bo pirsgirêka kurdan divê pêvajoya çareseriyê jinûve dest pê bike	3.91	3.96	3.84	3.86	3.97

	YEKÛN	REWŞA PERWERDEHIYÊ			ASE (ASTA SOSYO EKONOMÎK)			
		JÊR LÎSE	LÎSE	ZANÎNGEH	AB	C2	C1	DE
Bo pirsgirêka kurdan divê pêvajoya çareseriyê ji nû ve dest pê bike	3.91	3.91	3.96	3.84	3.86	3.97	3.86	3.97

	YEKÛN	HILBIJARTINÊN GIŞTÎ YÊN 2018AN			ÇEND SAL E LI BAJÊR E		
		AK PARTÎ	CHP	HDP	10 SAL Û JÊRÎ WÊ	JÎ 10 SALAN ZÊDETIR	JÎ DEMA KU ÇÊBÛME
Bo pirsgirêka kurdan divê pêvajoya çareseriyê ji nû ve dest pê bike	3.91	3.49	3.71	4.28	3.86	3.97	3.86

Aktorên ku ciwan di pêvajoya berê ya têkçûyî de berpirsariyê li wan dikin, bergeha ku têkildarî nêzîkbûna partiyan nîşan didin. Ciwanên nêzî HDPyê rexneyê li PKK û HDPyê digirin bes ciwanên ku nêzî AK Partiyê ne xwe ji dana dîmenek bi vî rengî vedizînin. Dengên xwe bidin partiyên siyasî yên cuda û di mijara têkçûna pêvajoya çareseriyê de di navbera aktorên ku sûcdar dikin de cudahiyeke cidî ya fikrî hebe jî, piraniya ciwanên kurd li gel wê yekê ne ku ji nû ve pêvajoyeka çareseriyê were destpêkirin.

“ Bi min para her du hêlan jî hebû. Bi qasî ku nîşanî me didan, leşkeran bi awayekî erênî lê dinihêrîn bes AK Partiyê li dijî dengên ku di 7 Hezîranê de wenda kir, bo parastina otorîteya xwe wiha kir. Rêxistinê jî ji heddê xwe borî, divê rewşên wekî hatina bajarên, bacstendina ji mirovan, sazkirina dadgehên, nebe. (Edene, mêr, HDP)

“ Divê em hemûyê navêjin ser dewletê, para PKKyê jî heye bes tirsê AKPyê ya ji bilindbûna HDPyê di warê siyasî de, sedema herî mezin e. (Stenbol, mêr, HDP)



“**Ji ber CHP û HDPyê qediya, jixwe HDPyê bi gotinên PKKyê hereket dikir. Ti sûcê AKP û dewletê nîne. Xwezî wiha nebûya. (Mêrsîn, jin, AK Parti)**

“**Rojên herî xweş yê tirkîyeyê bûn.. (pêvajoya çareseriyê) Bes êdî ji hêla kê hatibe xerakirin bênavber dê nifir li wan were kirin. Heke berdewam bikira bi rastî dê zahf xweş bûya. Nemirina mirovan tişteki hêvîbexş bû, wiha difikirim ku qendîlê xera kir, an jî dewleta kûr. (Diyarbakir, jin)**

Ji ber zimanê ku nasnameya kurdî radigire, dimehe û bi sedema ku cudakariyê dijîn, ciwanên kurd dixwazin ku pirsgerêkên kurdan çareser bibin. Li hêla din hêmanên wekî şahidiya ciwanan bo bilindbûna siyaseta sîvîl, di pîveka tirkîyeyê de kêmbûna vediyariya tundûtûjîyê jî di de-radîkalîzasyonê de cih digirin. HDPyê di 7ê Hezîranê de dengê zêde stend û ji wê dîrokê û şûn ve wekî aktorekî girîng di siyaseta tirkîyeyê de xwe nîşan da ku ev yek bû sedem ku bala ciwanan bo siyaseta sîvîl zêdetir bibe, Selahattin Demirtaş wekî aktorê hilgir yê vê eleqeyê derdikeve pêş.

Ji van hemû tiştan xuya dibe ku ciwan li hêviya pêvajoyeka çareseriyê ne ya ku siyaseta sîvîl tê de wekî aktorekî hêzdartir rol digire. Ciwan li gel rolgirtina aktîftir ya HDPyê dixwazin bibînin ku CHP jî di çareserkirina pirsgerêka kurd de bi awayekî vekirîtir “destê xwe têxe bin kevir.”

Jinên Ciwan ên Kurd û Azmûnên wan ên Resen

Xema herî bingehîn: pirsgirêkên aborî

Ji herêmeke diyar ya tirkiyeyê serbixwe, xema herî bingehîn ya jinên kurd aborî û aboriya ku xerab dajo ye. Lê belê pirsgirêka bêkariyê ya li herême bi awayekî diyartir derdikeve holê. Sînardarbûna qadên kar yên heyî û bi taybetî jî di encama perwerdehiya ku tê stendin de baweriya di derbarê nebûna derfetên beşdarbûna jiyana karî de dema mijar tê ser xeman, derdikeve pêş.

Di çîrokên cudakariyê de jinbûn derdikeve pêş

Dema pirsên têkildarî azmûnên wan ên li ser cudakariyê tê pirsîn, jin, berê pêşîn amaje bi jinbûna xwe dikin û dest bi axaftinê dikin, cudakariyên ku ji ber jinbûna xwe dijîn, parve dikin. Vê temayê, bi rêzê, nasnameya etnîk û piştî jî muxalifiya siyasî, dişopîne. Oldarî jî wekî tebeqeyeka azmûna jinbûnê derdikeve pêş: “carekê ez çûbûm derveyî welêt, piştî ku ji wê derê hatim, ji hêla hevcinsên xwe ve tûşî cudakariyê hatibûm. Min tiştên wekî, bi sekna xwe ya olî çawa dikarî rehet bî, rêzê bigirî, bihîstibû”. Îfade dikin ku cudakariyên li ser muxalifbûna wan ya siyasî jî bi awayekî diyar li parêzgehên rojavayê dijîn.

Lênihêrîna zarokan di ketina karî û berdewamkirina karî de astengeka diyar e

Xwedîzarokbûn, dema şertên aborî di ber çav tê girtin di beşdariya jinan bo jiyana kamûyî bi taybetî jî bo jiyana karî zehmetiyên cidî tîne. Di heman demê de azmûna jinên bizarok, bi awayekî diyar ji ya jinên koma heman temenî, cudatir e. Xwe di kategoriya “ciwan” de jî nanirxînin.

Jinên kurd yên sergirtî azmûna “bihevrebûnê” bi awayekî diyar dijîn

Bi taybet jinên sergirtî bêyî homojen bikin, mexdûriyetên xwe îfade dikin. Jinên sergirtî yên ku piştigiriya HDPyê dikin, îfade dikin ku di ser dîmenê HDPyê ya ku ji der ve sekuler û “dijberê olê”, marûzî rexneyan mane, li hêla dîn jî bi sedema ji ber ku sergirtî ne nikarin bibin muxalif, tûşî cudakariyan dibin. Jinên sergirtî yên ku piştigiriya HDPyê nakin jî diyar dikin ku vê carê cudakariya têkildarî nasnameya wan ya kurdbûnê laçeka wan dibe tebeqeyek.



Li herêmê peywendiya li gel malbatê wekî mijareka ji “parêzgehên rojavayê” cuda tê îfadekirin

Raçav hatin parvekirin ku malbat, bi taybetî di jiyana jinan de, di derbarê pirsgerêkên wan ên rojane de an jî di derbarê dahatûya wan de di stendina biryaran de, hereketkirina li gor van biryaran an jî di mijara çêkirina guherînan di jiyana wan de, bo jinên ciwan yê li herêmê rûdinên diyarkertir e. Ev yek dikare di tewereya kevneşopê de jî were fikirîn: ciwanên ku li parêzgehên rojavayê ne bo kevneşopên xwe zêdetir bi mesafe dixuyên, bes tê îfadekirin ku li herêmê têkiliyeka xurttir li gel kevneşopê heye. Ev rewş jî bi taybetî di jiyana wan ya rojane de wekî “bar”ê zêdetir kevneşopî û newekhevî li jinên herêmê vedigere.

Jinên li herêmê xwe ji aidiyetê, jinên li “parêzgehên rojavayê” xwe ji dijderketinê saz dikin

Yên li herêmê dijîn xwe zêdetir bi kevneşopan ve û bi nirxên çandî yê têkildarî kurdbûnê ve eynî dikin bes jinên ku li parêzgehên ku ew bi xwe wekî “parêzgehên rojavayê” kategorîze dikin rûdinên di derbarê siyaseta bilind û polîtîkayên li ser pirsgerêka kurd de îfadeyên nettir yê dijderketinê mijara axaftinê ye.

Hêviyên ji siyasetmedaran sînordar in

Dema me pirsî, heke siyasetmedarek li hember we be hûn dê çi bixwazin, bersiveka ku ji beşdarvanan hat tabloya giştî kurte dikir: “berê pêşîn heke bi rastî hatibe ku li min guhdar bike, ew tê wê wateyê ku wî her tişt bi ser xistiye”. Îtirazeka bingehîn ya ciwanan, bi taybetî ya ciwanên kurd û jinên ciwan di derbarê hebûna siyasetmedarên ku li pêdiviyên wan guhdar dike, heye.

Encam

Ev lêkolîna ku li ser ciwanên kurd yê li tirkîyeyê hûr bû, di serdemeka ku nîqaşên nifşa Zyê livdar bû hat meşandin. Ji ber vê sedemê hevşibî û cudahiyên ciwanên kurd bi ciwanên din ên civakê re, bû rojevên girîng yê mijara lêkolînê û civînên piştî lêkolînê. Li hêla din tiştên di pênc salên dawî de li dor pîrsgirêka kurd tîr jiyîn, dema tê fikirîn ku wekî tesîr li jiyana her kesî kiriye, li ya ciwanan jî kiriye, encamên lêkolînê girîngtir bûn. Binyatên çandî yê ciwanan, jiyarên wan ên rojane, peywendiyên wan ên hestiyarî û kamûyî yê bi tirkîyeyê re, awayên wan ên sazîkirina nasnameyê û gelemperîkirina wan, bawerîya wan ya olî û jiyarên wan, cudakariyên ku dijîn, têkiliya wan ya ku bi zimanê zikmakî re sazîkirina û hêviyên wan ên tîkildarî zimanê zikmakî û helbet fikrên wan ên li ser saziya siyasetê û awayê wan yê eleqedarbûna bi siyasetê re bûn sernavên girîng yê lêkolînê. Bi vî awayî hewl hate dayîn ku cudahî, hevşibî û guherînen ciwanan bi ciwanên din ên tirkîyeyê re û bi nifşê kurd yê beriya wan re, were fêmkirin.

Ji encamên bingehîn yê ji lêkolînê derket ew e ku kurd û ciwanên kurd yê ku li tirkîyeyê bi piranî wekî komeka yekpare û homojen tê nîrxandin, di rastiyê de xwedî binyateka heterojen e û ev nêzîkbûna giştîgir bi pîrsgirêk e. Li hêla din hat raçavkirin ku hêlên hevşibî yê ciwanan hem bi nifşê kurd yê berê re hem jî bi yê ciwanên tirkîyeyê re hebe jî, hêlên wan ên ku ji her du koman cuda dibin, hene. Ev dîte, nîşan dide ku ciwan bi darazên qalib yê berê dê nikaribin werin nîrxandin û çî cudahiyên tevahiya ciwanên li tirkîyeyê, çî jî ya ciwanên kurd divê ji hêla civaka sîvîl, sazkarên siyaset û polîtîkayê ve li ber çavan were girtin.

Ciwan li gel ku profîleka tirkîyeyî didin û wekî çandî bi piranî dahatûyeka projeksiyona dahatûyeka tewera wê tirkîyeyê derdixin holê jî, bi kurdbûnê ve bi awayekî diyar ji ciwanên din cihê dibin. Li gel ku di mijarên wekî binyatên çandî, tevgerên wan ên sosyalbûnê û mezaxtina çanda populer, awayên dengvedana pîrsgirêkên binyatî yê siyasî li jiyana wan ya rojane, hevşibî hebin jî, ciwanên kurd çî bi tesîra faktorên nasnameyê çî jî bi tesîra faktorên wekî koç û cudakariyê re meylên cuda pêşkêş dikin.

Nêzî nivê ciwanên kurd azmûna koçê jiyane. Nifûseka girîng ya ciwanan heye ku li parêzgehên rojavayê tirkîyeyê wekî nifşê duyem yê koçber dijîn. Ji bajarên herêmê berev rojavayê koç dewam dike. Ev rewş tê wê wateyê ku ciwan li welatê xwe ji derfeteke wesfdar ya perwerdehî û îstîdamê mehrûm in. Mehrûmbûna ji van derfetan, vediguhere astengiyeka wiha ku heke li rojavayê pîrsgirêkan bijîn jî nikarin vegerin welatê xwe. Beşeka girîng ya ciwanan dikirpîn ku heke derfet hebûya dê bixwastina ku li welatê xwe bijîn.

Wekî sosyo-polîtîk dîrnebûna ciwanên kurd ji zemîna tirkîyeyîbûnê, bi taybetî li gel yê ku nifşek berê koçî rojavayê kirine di nav çandeka tirkîyeyîtir dijîn, pîrsgirêkên girîng yê ku ciwan ji ber sedema kurdbûna xwe dijîn, di heman demê de pêwendiyên wan yê aidîyetê zêf dike. Ciwan diyar dikin ku marûzî cudakariyê dibin û ji ber ku emilandina kurdî bi lezgînî kêr dibe, dikesirin. Cudakarî wekî pîrsgirêka herî girîng ya ciwanên kurd derdikeve pêş. Her ji 10 ciwanan 7 hebê wan parve dikin ku wan azmûna cudakariyê jiyane. Ev her du rewş bi hev re nîşan didin ku heke ciwan bi awayekî çandî û coxraffî rotayeka tirkîyeyî teqîb bikin jî ji ber pîrsgirêkên cudakarî û kurdbûnê aidîyetên wan ên tirkîye, polîtîka û kamûyê qels bûye. Ciwan îfade dikin ku cudakarî, di demên ku pîrsgirêka kurd li dor nîqaşên çareseriyê dibe rojev de kêr dibe bes dema ku pîrsgirêk ji çareseriyê dûr dikeve û di tewera tundûtûjî/operasyonê de dibe rojev, cudakarî bi awayekî westîner bilind dibe. Ji lewre pîrsgirêka kurdan ya mijareka biheraret ya siyasetê ye, bi çarçoveya ku tê nîrxandin, bi awayekî girîng tesîrê li jiyana ciwanan dike.



Pêkan e were gotin ku yek ji wan komên ciwanên bêkar yên li tirkiyeyê yê herî merezdarî, ciwanên kurd in. Bi tenê ji sêyan yekê wan dikare bixebite bes beşeka girîng ya vê rêjeyê xebatkarên bêwesf vedigire. Ji her 10 ciwanên kurd tenê yek di karekî baş de dixebite. Tirkiyeya ku di rêza bêkariya ciwanan de li ser nîveka OECD û di welatên OECDê de di rêza pêşî de cih digire, bo ciwanên kurdan bergeheka neyînîtir pêşkêş dike. Ciwan kêmasiya îstihdamê li kêleka hincetên aborî bi cudakariyê re jî rave dikin.

Jinên ciwan ên kurd jî hem di îstihdamê de di rewşeka bidezavantaj de ne hem jî bi awayê giştî cudakariyê zêdetir dijîn. Azmûnên xweser yên jinan xwe di qada siyasetê de jî nîşan didin. Bo nimûne jinên sergirtî û HDPyî ji têgihana têkildarî hem ji ber îmajê “sekuler” ya ku bi ser HDPyê de tê spartin hem jî ji ber dîmenên wan yên di partiyeka muxalif “tew” de nikaribin di HDPyê de bin, aciz in.

Ciwan ji saziya siyasetê aciz in, dûrî rojeva germ ya siyasetê disekinîn bes eleqedarî siyasetê ne. Bi awayekî dişopînin ku AK Parti nêzî kodên kevneşopiyên dewletê bûye, CHP ji pozîsyona xwe ya klasîk ketiye rêyeke bo guherînê hewl dide, partiyên nû yên ku ji nav AK Partiyê derketine çî dikin, û têkiliyên xwe yên bi siyasetê re ne bi tesîra rêbazên kevneşopî lê bi çîrokên xwe yên şexsî û bi serdema ku şahidiya wê kirine, însa dikin.

Bi kurtî; pêkan e ku mirov bibêje, di serdemeka ku dinya bi lezgînî diguhere, bi qalibên kevin nixandînen li ser kurdan li hêlekê, ji ber ku ciwanên kurd komeka dînamîktir in, ji guherînê zêdetir tesîrê werdigirin. Li hêla din, daneyên lêkolînê derdixe holê ku nixandînen ku kurdan wekî komeka yekpare dibîne, dê çî fût bikin. Ciwanên kurd li gor mêrbûn û jinbûnê, li gor jiyîna li bajarên xwe an jî li rojavayê, li gor oldar an sekulerbûna wan, li gor nêzîkbûna wan ya bo HDP, AK Parti an jî siyasetek din, guherbarîyan nîşan didin. Nixandînen ku dê li ser ciwanan bînin kirin an jî polîtîkayên ku dê werin hilberandin divê vê binyata heterojen li ber çavan bigire da ku tesîrê li sihmeta vê têkiliya ku dê bi ciwanan re were sazîkirin bike ku ev yek ji wan faktorên girîng e di vê mijarê de. Ev xebat bi niyeta ku cîhana ciwanên kurd bi awayekî kûr binirxîne û tevkeriyeka erênî li vê têkiliyê bike, hat meşandin. Em careka din spasîyê li beşdarvan û piştevanan dikin ku bûn sedem ku cîhana ciwanan ji nêzvetir were fêmkirin.

